Di berhema wêjeyî ya destpêkê ya Sumerî de, daketina Înanna bo cîhana jêrîn, Înanna şeytanên ji cîhana jêrîn ji girtina Şhara, parêzvanê Umma, ku di nav xizaniyê de dijiya, dûr dixê (çav: "Inana's descent to the nether world". *Electronic Text Corpus of Sumerian Literature*. Retrieved 2021-07-22).

Ev cih herî kêmtir heta serdema Urukê hatiye dagirkirin. Gelek nivîsên "proto-kunîform" ji wir hatine. Her çend piraniya çavkaniyên nivîsê yên destpêkê ji Serdema xanedaniya Zû ya III ne jî, çend tablet û plakek ji Serdema Xanedaniya Zû ya I/II ji wir hatine (çav: Uruk period proto-cuneiform tablets from Umma).

Bo Serdema Xanedaniya Zû wê dikarê wê werênê ser ziman. Di destpêkê de wê, zilamekî girtî yê Umma li ser Stela Qermiçîyan dihê dîtin û tîkiliya wê bi umma ve dihê danin. Ji ber ku her du cih heta

demên nûjen nehatine kolandin, li gorî gelek nivîsên talankirî yên ku ji wan re peyda bûne, arkeologên berê bajarên kevnar ên di serdema Xanedaniya Zû ya Gişša û Umma de di nav navê yekane yê erdnîgarî yê Umma de kom kirine. Kolandina nûjen li van cihan ev yek zelal kiriye. Gişša piştî Serdema xanedaniya Zû dev ji dagirkeriyê berdaye û tenê yek hukumdar dihê zanîn, li gorî nivîsekek lapis lazuli ku dixwîne "Ji yazdana Inanna, Aka, keyê Gişša (ev nivîs terxan kiriye)" (çav: Frayne, Douglas, "Gišša and Umma", *Pre-Sargonic Period: Early Periods Volume 1* (2700-2350 BC), University of Toronto Press, p. 357-368, 2008).

Bi şerê xwe yê dirêj ê sînor bi Lagaşê re dihê zanîn, wekî ku tê ragihandin dora ... 2400 b.z ji aliyê Entemena ve, bajar di dora 2350 b.z. de, di bin desthilatdariya Lugal-Zage-Si de gihîştîye zirweya xwe, ku Ur û Uruk jî kontrol dikir.

Di Serdema Sargonic de jî wê pêşketina xwe wê bi heman rengê wê weke ku wê were diyarkirin wê bi awayekê wê bide domandin. Nivîseke Xanedaniya Destpêkê ya Lugalannatum ji Umma (Koleksiyona Muzexaneyê Louvre) ya bahsa wê demê û umma dikê. Di bin Împeratoriya Akad de Umma navendeke mezin a hêz û aborî bû ku tenê Adab û Uruk pê re dikarê reqabetê bikin. Yanzdeh parêzgarên di bin Akad de tene zanîn û her weha du jî ku dibe ku di bin Gutium (gûtîyan) de bin. Yek, Lu-Utu, radigihîne ku ji bo Ninhursag perestgehek û yek jî ji bo Ereshkigal ava kiriye. Namahni, parêzgarek ji dema Iarlagan ê Gutium a, avakirina perestgeha E-ula ya Ninura tomar dike. Serwerê serdema Sargonic ê Umma Lugalannatum perestgeha E-gidru li wir ava kiriye (çav: Foster. Benjamin R., "Archives and Record-keeping in Sargonic Mesopotamia", *Zeitschrift für Assyriologie und Vorderasiatische Archäologie*, vol. 72, no. 1, pp. 1-27, 1982).

Di nivîsara ji heman demê û ya gûtîyan wê weha wê di rengekê de wê bahsa wê bikê. "keyê Lugalannatum ê Umma ... Perestgeha E.GIDRU li Umma ava kir, emaneta xwe ya bingehîn veşart [û] rêzîknameyan birêve bir. Di wê demê de, Si'um keyê Gutium bû." û serwerê umma jî bû (çav: Douglas R. Frayne, "Umma", *The Sargonic and Gutian Periods* (2334–2113), University of Toronto Press, pp. 261-268, 1993).

Li vir wê di rewşa umma de wê weke ku mirov wê kifşdikê wê her ku wê pêde herê û wê kifşkirin wê di wê de wê werina kirin wê weke navendek giring a gûtîyan jî wê xwe di rengekê de wê bide diyarkirin. Di wê temenê de wê keyên gûtî ew dever wê weke navendek pêşketinê û bazirganiyê jî wê weke ku wê bi pêşxistina û derfetên pêşketinê ji wê re

afirandina. Her wusa keyên gûti wê, nişanaka wan a li wir wê, ne tenê bi serwerîya wan bê wê bi çerçoveya jiyane wê ya ku ew wê, dîkin wê di rengekê de wê bi ahenge urukê, Ur, nippur, sippar û hwd re wê, di rengekê de wê, bidina diyarkirin bê.

Di bin xanedana Ur III de, Umma bû navendeke girîng a parêzgehê. Çend parêzgarên Ummayê yên di bin Ur de têne zanîn, Aa-kala, Dadaga, û Ur-Lisi, hemî kurên Ur-Nigar, û Ninbilia, jina Aa-kala. Piraniya zêdetirî 30,000 tabletên ku ji vê deverê hatine dîtin nivîsên îdarî û aborî yên wê demê ne. Ew dihêle ku hûn têgihînek pir baş li ser karûbarên li Ummayê bidin. Navê salekê yê hikumdarê Ur III Shu-Sin "Sala Shu-Sin keyê Urê perestgeha Shara li Ummayê ava kir" bû. Hikumdarê din Ibbi-Sin jî navê salekê hebû "Sala Ibbi-Sin keyê Urê perestgeha Shara li Ummayê ava kir". Salnameya Ummayê ya Shulgi (nêzikî sedsala 21-an a berî zayînê) pêşengê salnameya Babîlî ya paşîn wê bide diyarkirin (çav. I. J. Gelb, "Sargonic Texts in the Louvre Museum", Materials for the Assyrian Dictionary 4, Chicago: The University of Chicago Press, 1970).

Di serdema Isin-Larsa ya piştî de, hukumdarê Larsayê, Sumuel (li dora 1894-1866 b.z.), wekî yek ji navên salên xwe yên paşîn "Sala ku Umma hate hilweşandin" destnîşan dike.

Ji wê aliyê ve wê umma wê weke aliyekê wê yê giring wê dikarê wê bi wê re wê werênê ser ziman ku wê pîr zêde wê, alaqa wê li wê were diyarkirin. Çendî ku wê alaqa li wê a mazin wê hebê jî lê wê ev alaqa wê di bin hin dîmenna de wê weke ku wê sergirtî û an nûxûmandî wê di rengekê de wê weke ku wê bimênê. Ev jî wê weke aliyekê wê yê din bê ku mirov wê karibê wê di rengekê de wê di dewama wê de wê weke aliyekê wê yê ku mirov wê karibê wê di şewayekê de wê karibê wê bide diyarkirin.

Li gorî çavkaniyên arkolojîkî ên bi dîtina dîtina hewayî ya Umma wê, çerçoveyek berfireh wê bi xwe re wê weke ku wê bide diyarkirin. Cihê Tell Jokha di sala 1854an de ji hêla William Loftus û di sala 1885an de ji hêla John Punnett Peters ê Zanîngeha Pennsylvania ve hatiye ziyaret kirin. Peters dît ku nivê wê bi girên qûmê hatiye nixumandin û qatên kevirên xebitî û qatên sifir dît (çav: Al-Mutawalli, N., "Excavation of Umma (modern Jokha), seasons 1 & 2.", Sumer 54, p. 53-82, 2009).

Di destpêka salên 1900an de, gelek tabletên Umma yên bi neqanûnî hatine kolandin ji Xanedaniya Sêyemîn a Urê dest bi bazara kevnar kirin. Ji sala 1999an heta 2002an li Jokhayê ji hêla tîmek Iraqî ve bi serokatiya Nawala Ahmed El-Mutawalli ve hate xebitandin, hejmarek tablet ji

serdemên Xanedaniya Destpêkê, Sargonîk, Ur III, û Babîliya Kevin û her weha perestgehek serdema Ur III û niştecîhên Babîliya Kevin hatin dîtin. Tabletên bizmari di pêvajoya weşandinê de ne. Lê hê jî gelek ji wan weke ne hatina weşandin û wê weke nûqteyekê di nepeniyê de hatibê hiştin wê weke were girtin. Lê agahiyên ji tabletên ku ew werina weşandin ku ew dihên diyarkirin wê bidina diyarkirin ku wê ji dema xanadana pêşî a umma û ya duyem wê zêde wê agahi wê bibin. Ya aliyê pêşî wê taqabûlî dema gûtiyan û serdema wan a xort û serweriya wan wê bikê. Di wê temenê de wê, ev tablat wê di derbarê wê serdema gûtiyan de jî wê weke çavkaniya giring û dîrokî wê, agahiyên giring wê bi xwe re wê weke ku wê bibina diyarkirin. Dema gûtiyan wê ber çî wê giring bê ku ew wê were fahmkirin? Ber ku ev dem û an serdem ji ya ku em wê tefkir dikin wê dirêjtir bê û wê pêşketinên ku wê di demên piştê wê bibin wê bingihê wan wê di awayekê de wê di wê demê de wê weke ku wê were avêtin û wê gûti û wê pêşketina wan û serdema wan wê di ahengekê de wê, bide diyarkirin.

Di sala 2016an de, tîmek ji Enstîtuya Arkeolojî û Dîrokî ya Slovakî bi serokatiya Drahoslav Hulínek li Tell Jokha dest bi kolandinan kir, ku bal kişand ser Perestgeha Shara. Xendekek (Xendek 1) ku di sala 2016an de hate kolandin nîşan da ku perestgeh du qonaxên avakirinê hebûn (Asta 3 û 4). Tê texmîn kirin ku Asta 4 ji serdema Akadîya Kevin e. Di sala 2017an de çargoşeyek li jor (Xendek 2) ya tellê, di nav gelek qulên talankeran de, hate vekirin û li Asta 5an avakirina Xanedaniya Zû hate dîtin. Di salên 2019 û 2020an de hejdeh tabletên bizmarî yên ji serdemên Babîliya Kevin, Ur III, Akadîya Kevin û Xanedaniya Zû di Xendek 2 de hatin dîtin, sê ji wan di cih de bûn. Lêkolînek topografîk nîşan da ku di serdema Xanedaniya Zû de Umma gihîştîye qadeke 400 hektarî, bi navenda bajêr a 40 hektarî (çav: Drahoslav Hulínek and Tibor Lieskovský, "Report Archaeological project SAHI - Tell Jokha, 2016", Slovak Archaeological and Historical Institute, 2016).

Cihê Umm el-Aqarib (ku li dirêjahiya 45.80°R û firehiya 31.60°N ye) bi qasî 6 kîlometreyan li başûrê rojhilatê Tell Joxa ye, bi qasî 5 kîlometreyên çargoşe digire nav xwe û ji 21 gir pêk tê ku ya herî mezin ji wan 20 metre li jor asta deştê ye. Tê texmînkirin ku ew bajarê kevînar ê Gişsa ye û piştî serdema Xanedaniya Destpêkê hatiye terikandin, û an jî hatiya wêrankirin. Cih cara yekem di dawîya salên 1800-an de ji hêla John Punnett Peters ve hatiye ziyaret kirin, û dît ku ew ji qûmê bêpar e û du bilindahiyên berbiçav ên kerpiçên pijandî yên bi bîtûm hatine danîn

nîşan dide. Ew di bin şert û mercên dijwar de bi tevahî 7 sezonan di salên 1999-2002an de (bi serokatiya Donny George Youkhanna û Haider A. Urebi) û 2008-2010an de (bi serokatiya Taha Kerim Abod) hatiye kolandin. Li Umm el-Aqarib, arkeologan qatên ji Serdema Xanedaniya Destpêkê (li dora 2900–2300 b.z.) kifş kirin, di nav de xanî, qesr û çend avahiyên mezin, di nav de du perestgehên Xanedaniya Destpêkê (Perestgeha Spî û Perestgeha H). Nêzîkî 70 "çavkaniyên bizmari" jî hatin kolandin. Dihê texmînkirin ku yazdanê parêzvan Ama-usumga/Usumgal-ana ye. Mozaîkên konî yên ji axê yên serdema Urukê jî li wir hatine dîtin (çav: Frayne, Douglas R., "The Struggle for Hegemony in 'Early Dynastic II'Sumer", The Canadian Society for Mesopotamian Studies Journal 4, pp. 37-75, 2009).

Cihê Tell Shmet (her weha Tell Schmidt û Tell Shmid) jî li nêzîkê ye, nêzîkî 10 kîlometreyan li bakurê rojavayê Umma û di mesafeya dîtbarî ya Zabala de ye. Ew li ser qeraxên şaxê rojhilatê çemê Firatê ye, rast li jor kanala ku ber bi Zabala ve diçe. Ew di serdema Ur III de beşek ji parêzgeha Umma bû. Pîvana cihê 990 bi 720 metre (712,800 metreçargoşe) ye. Bermahiyên sereke yên Sargonîk û Ur III yên cihê ji hêla bernamêyek Wezareta Çandiniyê ve ji bo çandina daran ji bo pêşgirtina li girên qûmê hatin hilweşandin. Di bersiva talankirinê de ku di sala 1994an de dest pê kir, Lijneya Kevnar û Mîrateya Dewleta Iraqê di salên 2001 û 2002an de di bin serokatiya Mihemed Sebrî Ebdulrehim de kolandinên rizgarî pêk hanîn. Hemû tomarên kaxezi yên kolandinan di talankirina deverên niştecibûnê de piştî şerê 2003an winda bûn. Kerpîçên "plano-konveks" û deverên niştecibûnê ya serdema Xanedaniya Zû III û Akadî hatin dîtin. Di nav van keşfan de 67 tabletên bi şêweya bizmariî yên ji axê, bi dehan mohrên bangorî û hejmarek tiştên keviri û metalî hebûn. Piraniya tabletan dîroka wan vedigere ED III, ya herî dawî jî Ur III ye. Tablet piştgirî didin vê pêşniyarê ku navê kevnar ê cihê Ki.anki bû. Ew navên yazdanên Ninazu û Dumuzi-Marû destnîşan dikin. Tenê şeş ji tabletan hatine weşandin. Mozaîkên bizmarî (koni) yên ji axê yên serdema Urukê jî li cihê hatine dîtin (çav: Abdulaheem, M. S., "The final report of the excavations in Shmet – 1st season 2001", SBAH, Ministry of Culture, Rep. of Iraq (in Arabic), 2001).

Dahûra nivîsî ya berê nîşan dabû ku KI.AN pir nêzîkî Zabala bû. Di dema serweriya Rimûş, serwerê duyemîn ê Împeratoriya Akadyayê de, KI.AN, di bin parêzgarê xwe Lugal-KA de, tevî serhildanek herêmî bû û tîk çû. Di serdema Ur III de KI.AN xwedî ensî (parêzgar) bû. Di wê

serdemê de tê zanîn ku perestgehek ji bo hukumdarê yazdanî Şulgî (bi navê "e-Sulgi-ra") û her weha perestgehên ji bo yazdanên Šara, Ninurra, Amarsuena, Geštinanna, Dumuzi, Gula, Ninlagaša, û Nine'e hebû (çav: Douglas R. Frayne, "Akkad", The Sargonic and Gutian Periods (2334–2113), University of Toronto Press, pp. 5-218, 1993).

Di dema dagirkirina Iraqê ya sala 2003an de, piştî ku bombebarana Koalîsyonê dest pê kir, talanker daketin ser wê cihê ku niha bi sedan xendek û çalan tijî ye. Di vê pêvajoyê de, ihtîmalên kolandin û lêkolînên fermî yên pêşerojê bi giranî ketin xetereyê. Di sala 2011an de, Tora Mîrata Cîhanî, ku gefên li ser cihên mîrata çandî li welatên pêşkeftî dişopîne, wêneyên hewayî yên ku Umma di salên 2003 û 2010an de berawird dikin, weşand, ku dîmenek ku di wê demê de ji hêla xendekên talankeran ve hatiye wêrankirin nîşan dide - bi tevahî bi qasî 1.12 km çargoşe. Tabletên bizmari ên herêma Umma yên desteserkirî berdewam dikin ku rêya xwe ber bi Muzexaneya Iraqê ve bibînin, di nav de komek ji 1500 kesan di sala 2009an de jî hebû. (çav: Saadoon, Abather Rahi, "Sumerian Texts from the Archive of the Princess Šāt-Eštar in the Collections of the Iraq Museum", Iraq 80, pp. 213-231, 2018).

Li vir wê dîroka umma wê di rengekê de wê ji gelek aliyan ve wê weke ku wê di bin nepeniyê de wê bimênê. Ne tenê wê ji demên kevnera û kêmbûna agahiyan bi tenê wê ev bibê. Weki din wê di demên hemdem de wê, ev herêm û çavkaniyên ku wê di derbarê dîroka wê de ku wê agahiyê bidin ku ew ne hatina parastin û piştî wê wînda bibin û an wê werina tûnakirin. Di wê temenê de wê ev xabat wê nehêlin ku wê lêkolînek bi rêk û pêk li ser dîroka herêmê bi rastin were kirin. Di wê temenê de wê dikarê wê di rengekê de wê di dewama wê de wê bi wê re wê di şêwayekê de wê werênê ser ziman ku wê, ji wê aliyê ve wê dema ku em, wê dinerin wê, heta nûha wê gelek hêvî li ser bi hezaran tablatên ku wê ji herêmê wê werina derhanin û hê ne hatina weşandin ku ew dîroka wê roni bikê wê li ser wê were sekin in.

Her çend xanedana yekem a Umma li ser bingeha behskirinên di nivîsên hevdem ên bi xanedaniyên din ên ji serdema Xanedaniya Destpêkê (ED) III de navdar bûye jî; ew di Lîsteya keyên Sumerî de nehatiye nivîsandin. Xanedana yekem a Umma beriya xanedana Akad bû, di demekê de ku Umma bandûrek berbiçav li herêmê dikir. Tenê yek hukumdar (Lugal-zage-si) ji Umma di listeya keyên sumeri de hatiye binavkirin; lêbelê, navê wî wekî yekane hukumdarê xanedana sêyem a Urukê xuya dike. Ku em wê agahiyê wê weke agahiyek rastin wê hildina li dest wê demê em

dikarin hinek ihtimalan li berçav bigirin. Ya pêşî wê ew bê ku wê, weke Umma wê di wê demê de wê, di bin serwerîya urukê de bê. Ihtimala duyem ku wê serwerîya wan yek bê û an wê, umma wê serwerîyek ku wê uruk wê di ahenge wê de wê karibê were fahmkirin wê karibê bi wê fahmbikê bê (çav: Sallaberger, Walther; Schrakamp, Ingo (2015). History & Philology (PDF). Walther Sallaberger & Ingo Schrakamp (eds), Brepols. pp. 74–80).

Di dîroka herême de wê weke aliyekê wê yê giring wê weke ku wê bi umma re wê were dîtin wê di demên gûtiyan de jî wê weke navendek giring wê xwe di rengekê de wê bi wê re wê bide diyarkirin. Ji wê aliyê ve wê umma wê dîroka wê weke ku me li jor wê hani ser ziman wê bi giringiya xwe wê di rengekê de wê weke ku wê derkeve li pêş.

Di derbarê dîroka umma de wê dikarê wê di dewama wê de wê bi wê re wê werênê ser ziman ku wê, çawa wê weke aliyekê wê yê giring bê wê hinek aliyên weke bi kifşkirinên ku wê di dema xanadana yekem a umma ku wê taqabûlî salên li dora 2900 b.z. wê bikê de wê weke ku wê di dema kassitan de wê were diyarkirin wê bi tablatên weke kudurru wê bê diyarkirin wê di wê demê de bi 'ushumgal' re wê karibê wê kifşbikê. Ushumgal wê tabletek dema ummaya kevn de ku wê weke kevirê kudurru ê dema kassitan wê were diyarkirin û wê li wê were şibandin wê were kifşkirin. Ev wê weke nişanayeka têkiliya dema kassit û ya gûtiyan û an serdema xanadana ummayê a pêşîn jî wê di rengekê de wê were pênamekirin.

Minaq stel û an tableta Ushumgalê tableteke kevirî ya Sumerî ya destpêkê ye, ku dîroka wê vedigere Serdema Xanedaniya Destpêkê I-II (li dora 2900-2700 b.z), û dibe ku ji Ummayê be. Niha li Muzexaneya Hunerê ya Metropolitan, New York City ye (çav: Art of the First Cities: The Third Millennium B.C. from the Mediterranean to the Indus. Metropolitan Museum of Art. 2003. p. 53).

Stel 22 cm bilind e. Bi qismî hatiye deşîfrekirin, behsa veguhestina zû ya xwedîtiya erdê dike. Li ser zilamekî mezin etîketek hatiye nivîsandin, ku dikare wekî "Uşumgal, kahînê pab-šeš ê (yazdanê) Šara" were xwendin. Li aliyê din Shara-igizi-Abzu, keça Ushumgal, radiweste (çav: I. J. Gelb, P. Steinkeller, and R. M. Whiting Jr, "OIP 104. Earliest Land Tenure Systems in the Near East: Ancient Kudurru", Oriental Institute Publications 104 Chicago: The Oriental Institute, 1989, 1991).

Stel wekî cureyek "Kudurru ya kevnar" hatiye binavkirin, cureyek stela ku ji serdema Kassites di hezarsala 2-an a b.z. de tê zanîn (çav: Beaulieu,

Paul-Alain (2018). A History of Babylon, 2200 BC - AD 75. John Wiley & Sons. p. 35).

Navê "Akka" di Stela Ushumgalê de wekî Ak gal-ukkin, "fermîdarê Ak gal-ukkin" xuya dibe. Dihê diyar kirin ku ev dikare ji bo Aga yê Kîş bixwe be (çav: Frayne, Douglas. The Struggle for Hegemony in "Early Dynastic II" Sumer. pp. 65–66).

Herweha di Nivîsara Tummal de bi bavê xwe Mesannepada re tê behs kirin ku piştî ku perestgeha Tummal ji bo Enlil û Ninlil li Nîppurê "wêran bû", wî restore kiriye wê hinek têgînên ku wê taqabûlî wê nûqteyê wê bikin wê bên dîtin:

"En-me-barage-si, key, Iri-nanam di perestgeha Enlil de ava kir. Aga, kurê En-me-barage-si, Tummal geş kir û Ninlil hanî nav Tummal. Piştê Tummal cara yekem hilweşiya. Meş-Ane-pada Bur-şuşua di perestgeha Enlil de ava kir. Meş-ki-ağ-nuna, kurê Meş-Ane-pada, Tummal geş kir û Ninlil hanî nav Tummal."

Nivîsara Tummal şahidiya dîrokek nisbî ya Meskiagnun û bavê wî di navbera Enmebaragesi û Gilgamesh de dike, lê Lîsteya keyên Sumerî bav û kur du nîş piştî Enmebaragesi û Gilgamesh datîne. Samuel Noah Kramer destnîşan dike ku ev yek "pirsgirêkek kronolojîk derdixe holê ku niha nayê (û an nikarê were) çareserkin." Meskiagnun di Lîsteya keyên Sumerî de weha dihê behs kirin:

"... Uruk bi çekan hate hilweşandin, keyeniya Ur hate standin. Li Urê Mesannepada key bû, 80 salan hukum kir; Meskiagnun, kurê Mesannepada, key bû, 36 salan hukum kir; Elulu, 25 salan hukum kir; Balulu, 36 salan hukum kir; 4 key, salên: 171(?) hukum kirin. Ur bi çekan hate hilweşandin; keyeniya Awan hate standin."

Di wê nûqteyê de wê, di zane min de wê, bo ku wê têngîna pirsgirêka ku wê bahsa mijarê û an gotinê bê ku wê fahmbikê û an ji wê re wê çareseriyê wê werênê wê dîsa wê pêwîstiya kifşkirina demên berê ên weke yên xanadana ummayê ên xanadana pêşî bin.

Di wê demê de wê, di rengekê de wê, ne tenê wê bi reng û awayê serwerîyek xanadanî ku ew dibê wê karibê bi tenê wê fahmbikê. Minaq wê ew dîroka wê ya heta wê demê ku wê were li dora pêncsadsalên berê ên wê çawa di awayekê de wê bi xwe wê derbas bibin wê bi serê xwe wê weke mijarek teybet a fahmkirinê wê biafirênê.

Ji wê aliyê ve wê fahmkirin û an şewayekê fahmkirinê wê heta roja me wê zêde ne serwer bê. Tenê me li ser çavkaniyan re wê çawa bûya û kî bûya serdest wek key û hwd wê fahmkiriya. Lê ji wê zêdetirî wê di

rengêkê din de wê ew rewş wê xwe di şêwayekê de wê bi wê re wê weke aliyekê wê yê giring wê karibê bide diyarkirin. Rewşa ummayê wê ji wê aliyê ve wê hinek fêrbûnên ku ew hê bi wê re ew ne hatina kifşkirin wê di xwe de wê weke ku wê bihawênê.

Ur-Pabilsag ku wek ur-pa-bil-sag dihê xwendin; li dora 2550 b.z jiya wê hukumdarekî pêşîn ê Xanedana Yekem a Urê were pênasekirin ku ew di sedsala 26an a b.z de jiya. Ew di Lîsteya keyên Sumerî de xuya nake, lê ji qatek nivîsê ya li Urê hatî dîtin, ku sernavê "Ur-Pabilsag, keyê Urê" li ser e, dihê zanîn. Hatiye diyar kirin ku gora wî li Goristana keyeniyê ya Urê ye (Gora PG ku wê were diyarkirin ya wî bê. Dibe ku ew li dora 2550 b.z. miribe (çav: Hamblin, William James. Warfare in the ancient Near East to 1600 BC: holy warriors at the dawn of history, p. 49. Taylor & Francis, 2006).

Her weha hatiye diyar kirin ku Ur-Pabilsag kurê key A-Imdugud bû, ku ji gora "PG 1236" dihê zanîn, ku avahiya gorê ya herî mezin û dibe ku ya herî kevin a li Goristana keyeniyê ya Urê ye. Gora Ur-Pabilsag (Gora PG 779) bi gelemperî wekî duyemîn kevintirîn gora li wir tê hesibandin, û dibe ku hevdemê gora PG 777 be, ku tê texmînkirin ku gora şahbanûya wî Meskalamdug a (gora PG 755, an jî dibe ku PG 789) dibe ku kurê wî be (çav: Reade, Julian (2003). Art of the First Cities: The Third Millennium B.C. from the Mediterranean to the Indus. Metropolitan Museum of Art. p. 96).

Li vir ya ku wê bale me bikişênê wê ew bê ku wê navên dihên diyarkirin wê li gorî zimanê roja me wê hinek wateyna wê bidina me. Minaq navê A-Imdugud wê, bi wateya ya yê ku ew wî "im digot" Im weke têngînek ku ew li ser dihê axiftin bê dihê diyarkirin. Li vir ew navekê teybet û an gelemperî xwe dide diyarkirin. Wekî din navê Pabilsag wê wateyên weke têngihên weke bav bi pilê şabûnê di rengêkê de wê wateyekê wê bide me. Wekî din navê Meskalamdug bi têngîna me ji ka-lam digot û hwd re wê wateyekê bide me. Di xosletên van gotinan hemûyan de jî wê kirdeyek weke ya navî ku ew ji wê dihê bahskirin û ew nayê diyarkirin ku ew çiya wê, bide diyarkirin. Tenê dikarin bi hinek kirdeyên morfolojîkî li ser wan navkirinan re dikarin hinek têngî werina kifşkirin û ev jî dikarê weke manipulasyonêkê bimênê.

Wekî din her weha Pabilgagaltuku, û ana Pabilgeshgaltuku, pa.bil.ğeş-gal-tuku; ku wê weke navekê li dora 2450 b.z. bijî bê. Wekî waliyê Umma (ensi) bû, bajar-dewletek li Sumerê. Ew ji aliyê Ur-Nanshe yê Lagash ve hat girtin. Paşê wî Uş bû (çav: Since Ninta ("Uş") was a

contemporary of Eanatum, he is assigned to a generation subsequent to Pabilgaltuku." in Sallaberger, Walther; Schrakamp, Ingo. *Philological Data for a Historical Chronology of Mesopotamia in the 3rd Millennium*. p. 74–75).

Pabilgagaltuku ji nivîsek Ur-Nanshe tê zanîn, ku tê de Ur-Nanshe îdîa dike ku wî Umma têk bir û Pabilgagaltuku girt: pabilgax (pa.bil.ğeš) -gal-tuku ensi umma(geš.kuşu) ki mu-dab

"Wî Pabilgagaltuku, Waliyê Ummayê girt." Pabilgagaltuku di "Stele of the Vultures" de jî tê gotin, wekî ku di paşerojê de ji hêla Ur-Nanshe ve hatî têkbirin (çav: FAOS 5/1 Urn. 51 = RIME 1.9.1.6.b rev. IV 5-8: in Sallaberger, Walther; Schrakamp, Ingo. *Philological Data for a Historical Chronology of Mesopotamia in the 3rd Millennium*. p. 74–75).

Enakalle an Enakalli ku ew li dora. 2450 b.z. jiya di serdema Xanedaniya Zû ya III (2600–2350 b.z.) de keyê Umma, bajar-dewleteke Sumerî bû. Serweriya wî herî kêr 8 salan dom kir (çav: Sallaberger, Walther; Schrakamp, Ingo (2015). *Arcane III* (PDF). BREPOLs. p. 75).

Pêşeyê wî Uş (ush), hukumdarê Umma, piştî ku stela Mesilimê ji holê rakir, hêrîşî Lagaşa nêzîk kir, hewl da ku Gu-Edîn bigire, wekî ku di Konê Entemenayê de tê tomar kirin. Uş ji hêla Eannatum ê Lagaşê ve di şerekî de ku di Stela Qermiçan de tê tomar kirin, bi tundî têk çû, di şer de 3,600 zilam winda kir. Piştî Uş ji hêla gelê xwe ve hate hilweşandin û kuştin (çav: Sallaberger, Walther; Schrakamp, Ingo (2015). *History & Philology* (PDF). Walther Sallaberger & Ingo Schrakamp (eds), Brepols. p. 74–76).

Enakalle (enakalla di wateya kese kal ê li jor li ser serê disekinê de ji di zimanê roja me de dihê xwandin.), cîgirê wî, di dawiyê de bi Eannatumê Lagaşê re peymanek aştîyê çêkir, wekî ku di nivisara (koniya) Entemenayê de hatiye vegotin ku wê sînore wê bi entamenayê wê were diyarkirin.

Ur-Lumma ku wek Ur Lum-ma dihê diyarkirin li dora li dora 2425 b.z. jiya, wek keyekî dewleta bajar-dewleta Sumeran a Umma bû. Bavê wî key Enakalle bû, ku ji hêla Eannatumê Lagash ve hatibû têkbirin. Ur-Lumma sernavê "key" (Lugal) îdîa kir. Keyeniya wî herî kêr 12 salan dom kir (çav: Sallaberger, Walther; Schrakamp, Ingo (2015). *Arcane III* (PDF). BREPOLs. p. 76).

Ur-Lumma dîsa bi Lagash re, ji bo deşta bi bereket a Gu-Edin, ket nav pevçûnek herêmî. Ur-Lumma, hêrîşî Lagash û keyê wê Enannatum II, cîgirê Eannatum I kir, û karî ku "stîla Eannatum û perestgehên yazdanan

ên ku li kêleka wê hatine danîn bi agir hilweşîne". Ur-Lumma Enannatum têk bir û Lagash dagir kir, lê ew di dawiyê de ji hêla Entemena II, kurê Enannatum I ve hat paşve xistin (çav: Lambert, Maurice (1965). "L'occupation du Girsu par Urukumma roi d'Umma". *Revue d'Assyriologie et d'archéologie orientale*. 59 (2): 81–84).

Cihê Ur-Lumma bi biraziyê wî duyemin, kahin-key, hat danîn, ku ew jî hêrîşê Lagaş kir, lê dîsa ji aliyê Entemena ve têk çû (çav: Lambert, Maurice (1965). "L'occupation du Girsu par Urukumma roi d'Umma". *Revue d'Assyriologie et d'archéologie orientale*. 59 (2): 81–84).

Di dewama wê de wê keyek din ê umma wê IL bê ku wê were ser taxt û ew wê dema wî de wê ew rewş wê hinekê din wê xwe bidina diyarkirin. Il ku ew wek 'IL' dihê diyarkirin wê wek key, an Lugal ê umma li dora 2420 b.z. bijî. Keyê bajar-dewleta Sumerî Umma bû. Dibe ku bavê wî Eandamu bû, û bapîrê wî jî key Enakalle bû, ku ji aliyê Eannatum ê Lagaşê ve hatibû têkbirin Il cîgirê Ur-Lumma bû. Li gorî nivîsekê, berî ku bibe key, ew rêveberê perestgehê li Zabalamê bû: "Di vê demê de, Il, ku rêveberê perestgehê yê Zabalamê bû, ji Girsuyê vekîşîya Ummayê û walîtiya Ummayê ji xwe re girt." Wî herî kêr 14 salan hukûm kir (çav: Sallaberger, Walther; Schrâkamp, Ingo (2015). *History & Philology* (PDF). Walther Sallaberger & Ingo Schrâkamp (eds), Brepols. p. 76).

Ew bi Entemena, hukûmdarê Lagaşê re ket nav pevçûnek axê, wekî ku di nivîsekê de tê gotin: "Wî (Il) av ji kanala sînora Ningirsu û kanala sînora Nanshe (...) veguhest. Dema ku ji ber wan kanalan, Enmetena, parêzgarê Lagaşê, şand ba Il, Il, parêzgarê Umma, ku zevîyan didize (û) xerab diaxe, ragihand: 'Kanala sînora Ningirsu (û) kanala sînora Nanshe ya min e! Ez ê bendava sînora jî Antasura ber bi Edimgalabzu ve biguhezînim!' Lê Enlil (û) Ninhursang ew nedan wî." (Çav: Sallaberger, Walther; Schrâkamp, Ingo (2015). *History & Philology* (PDF). Walther Sallaberger & Ingo Schrâkamp (eds), Brepols. p. 77–78).

Il jî hêla Entemena ve têk çû, ku ji Lugal-kinishe-dudu yê Uruk, cîgirê Enshakushanna, ku di listeya key de ye, alîkarî xwestibû dide diyarkirin (çav: Jordan, Michael (1993). *Encyclopedia of gods: over 2,500 deities of the world*. Internet Archive. New York: Facts on File. p. 245).

Il paşê li dijî Enannatum II, keyê Lagaş û cîgirê Enmetena, şer kir û ew têk bir, û bi vî awayî dawî li xanedana Lagaş a ku ji hêla Ur-Nanshe ve hatibû damezrandin hanî (çav: Williams, Henry Smith. *The Historians' History of the World Vol.1* (of 25) (Illustrations): Prolegomena; Egypt, Mesopotamia. The Trow Press. p. 171).

Kurê wî, Gishakidu, li şûna wî hat ser taxt. Piştî wê heman pirsgirêkên nava bavê wî û lagashê wê di rengekê de wê li ser axê ew wê di dewama wan de wê bide domandin. Wî tēja serketivtina dema bavê xwe jiyankir wek keyekê serkevti. Diwê demê de wî xwest ku ew tifaqna xwe bibînê û wê hinek çavkani wê diyar bikin ku wî li urukê û an keyeniyên dorê têkili bi wê minasebetê daniya. Lê di derbarê wê de wê ti agahi wê di destê me de wê nebin (çav: Sallaberger, Walther; Schrakamp, Ingo (2015). *History & Philology* (PDF). Walther Sallaberger & Ingo Schrakamp (eds), Brepols. p. 78).

Tablo ya keybanuya Bara-irnum a Umma, "jina Gishakidu, keyê Umma, keça Ur-Lumma, keyê Umma, neviyê Enakalle, keyê Umma, bûka II, keyê Umma", ji yazdanê Shara re, ji bo spasiya ku jiyana wê xilas kiriye dihênê ser ziman (çav: Thomas, Ariane; Potts, Timothy (2020). *Mesopotamia: Civilization Begins*. Getty Publications. p. 108).

Umma wê di rengekê de wê, çendî ku wê, bi berberiya xwe ya bi lagashê re wê di rengekê de wê bijî jî lê wê li herêmê wê weke navendek giring wê xwe di rengekê de wê bide diyarkirin. Hem jî têkiliya xwe ya bi hewirdorê û hem jî bi wucana xwe re wê di rengekê de wê karibê wê di rengekê de wê bi wê re wê werênê ser ziman. Di wê nûqtayê de wê, çendî ku wê weke ku wê bi lagashê re wê di rengekê de wê weke di nava pevçûnê de jî lê wê gelek demên wê yên dirêj ku ew diji û heta wê demê dihê û hebûna xwe diparêzê wê karibê wê bahsa wê bikê. Çendî ku wê bahsa gelek pevçûnên nava wê û lagashê wê werina kirin ku ew car bi car wê têkherê jî lê wê hebûna xwe wê bi serwerîya xwe ya keyeni û hwd re wê karibê bide domandin.

Li gorî çavkaniyan wê li umma wê piştê Ur-lamma û Gishakidu wê, di dewama wan de wê, Me'annedu ushurdu wê werin. Piştî wan jî wê edin wê were ku wê taqabûlî dema Lugalanda wê bikê. Piştê ulkush wê weke beremberê dema urukagina wê di rengekê de wê bahsa wî were kirin. Di dema serwerîya imparatori de wê, dema Lugal-zage-si ku wê were û ku wê weke kurê ulkush wê were diyarkirin. Di wê demê de wê demek giştî wê, were dîtin ku wê were diyarkirin û wê derketina ser ramyariya bajar-welatan re wê di rengekê de wê weke ku wê bibê wê xwe bide diyarkirin.

Di wê demê de ku wê navenda wê kish bê wê keyeniya ur-zababa wê derkeve li pêş. Piştê wê êdî wê pêvajoya ku wê bi ber ya akadê ve û an sargonê akadî ve wê herê di rengekê de wê weke aliyekê wê yê din ku mirov wê karibê wê di wê temenê de wê di rengekê de wê di dewama wê de wê werênê ser zoiman bê.

Minaq Ikun-Şamaş an jî Iku-Şama ku wê li dora 2500 b.z, wê wek keyê duyemîn ê keyeniya Mari bû. Li gorî François Thureau-Dangin, key di demekê de ji Ur-Nanshe yê Lagaşê berê hukumdari kiriye. Ew yek ji sê keyên Marî ye ku ji arkeolojiyê têne zanîn, û dibe ku yê herî kevin be. Keyekî din Iku-Şamagan bû, ku ji peykerê bi nivîsekê jî tê zanîn, li Muzexaneyê Neteweyî ya Şamê ya. Keyê sêyemîn Lamgi-Marî ye, ku wekî Îşgi-Marî jî tê xwendin, ku ji peykerê bi nivîsekê jî tê zanîn, ku niha li Muzexaneyê Neteweyî ya Helebê ye (çav: Spycket, Agnès (1981). Handbuch der Orientalistik (in French). BRILL. p. 88).

Di nivîsên xwe de, Ikun-Şamaş zimanê Akadî bi kar haniye, lê hevdemên wî yên li başûr zimanê Sumerî bi kar hanîne. Sernavê wî yê fermî di nivîsan de "keyê Marî" û "ensi-gal", an jî "keyê Bilind" ê yazdanê Enlil bû. Ew ji peykerê bi nivîsekê tê naskirin, ku wî ew ji yazdanê Şamaş re terxan kiriye (çav: Spycket, Agnès (1981). Handbuch der Orientalistik (in French). BRILL. p. 86).

Xuya ye ku axa Ikun-Şamaş başûrê Babîlê di nav xwe de digirt. Weke keyekê dema gûtî a demê bê. Piştî wê di dema akadê de wê, têkiliyên nava demê de wê, bi rewşa serwerîya xwe wê di rengekê de wê weke ku wê bide diyarkirin.

Têkiliyên keyeniya mari ên li herêma wê di wê demê de wê wekeku wê weke aliyekê wê yê ku mirov wê karibê wê hinekê wê li ser wê bisekinê bê. Ev wê karibê wê weke aliyekê vegotin bar bê.

Mari ku di nivîsên bizmarî wek ma-riki dihê diyarkirin., Tell Herîrî ya îroyîn wek bajarekî Semîtîk ê kevnar bû li Sûriya îroyîn bû. Bermahiyên wê ji telekê 11 kîlometreyan li bakur-rojavayê Ebû Kemalê li ser qeraxa rojava ya Çemê Firatê, bi qasî 120 kîlometreyan li başûrê rojhilatê Dêr ez-Zorê pêk dihên. Ew di navbera salên 2900-1759 b.z. de wekî navendeke bazirganiyê û dewleteke hegemonîk geş bû. Bajar di nivê rêyên bazirganiyê yên Firatê de di navbera Sumer li başûr û keyeniya Eblaî û Levant li rojava de hatiye avakirin.

Marî pêşî di nivê sedsala 26an a b.z de hate terikandin lê ji nû ve hate avakirin û berî 2500 b.z bû paytexta dewleteke hegemonîk a a herêma a Rojhilat bûya. Ev Mariya duyemîn bi reqîba xwe Ebla re ket şerekî dirêj û bi nêzîkbûna xwe ya xurt bi çanda Sumerî re tê zanîn. Ew di sedsala 23an a berî zayînê de ji aliyê Akadiyan ve hate wêrankirin, yên ku destûr dan ku bajar ji nû ve were avakirin û parêzgarî leşkerî (Şakkanakku) tayîn kirin. Bi hilweşîna Împeratorîya Akadiyan re parêzgar serbixwe bûn û bajar wekî navendek herêma ya geliyê Firatê ji nû ve ava kirin.

Şakkanakkuyan heta nivê duyemîn ê sedsala 19an a berî zayînê li Mari hukum kir, dema ku xanedanî ji ber sedemên nenas hilweşiya. Demek kurt şûnda, Mari bû paytexta xanedana Amorît Lim. Amorît Mari tenê demek kurt dom kir berî ku di dora sala 1761 berî zayînê de ji aliyê Babîliyan ve were wêrankirin, lê ew wekî wargehek piçûk di bin desthilatdariya Babîliyan û Asûriyan de ma berî ku di serdema Helenîstîk de were terikandin û ji bîr kirin.

Mari hem yazdanên Semîtîk û hem jî yên Sumerî-gûtî dihebînin û bajarê xwe wekî navendeke bazirganiyê ya sereke ava kirin. Her çend serdemên berî-Amorît bi bandûra çandî ya giran a Sumerî-gûtî ve dihatin xuya kirin jî, Mari ne bajarê koçberên Sumerî bû lê neteweyek bi zimanê Semîtîk diaxivî bû ku zaravayek dişibiya Eblaîte. Amorî Semîten Rojava bûn ku berî sedsala 21an a berî zayînê dest bi bicihbûna herêmê kirin; di serdema xanedaniya Lim de (li dora 1830 berî zayînê), ew bûn nifûsa serdest a li Nîvgirava Bereket.

Lê wê dema ku em têkiliyên demê li berçav bigirin wê tenê wê weke têgînek ew wê di dema gûftîyan de wê weke ku wê bibê bê.

Baweriya wê heye ku Mari ji wargeheke biçûk nehatiye avakirin, lê di dora sala 2900 berî zayînê de di serdema Xanedaniya Destpêkê ya Mezopotamyayê ya gûtî de wekî bajarekî nû hatiye damezrandin da ku rêyên avê yên rêyên bazirganiyê yên Firatê kontrol bike ku Levant bi başûrê Sumerî ve girêdide. Bajar ji bo parastina ji lehiyê bi qasî 1 heta 2 kîlometreyan dûrî çemê Firatê hatiye avakirin, û bi kanalek çekirî ya 7 heta 10 kîlometre dirêj ve bi çem ve girêdayî bû ku rêya wê îro zehmet e ku were destnîşankirin (çav: Margueron, Jean-Claude (2013). "The Kingdom of Mari". In Crawford, Harriet (ed.). The Sumerian World. Translated by Crawford, Harriet. Routledge. p; 520).

Kolandina bajêr dijwar e ji ber ku ew di bin tebeqeyên paşîn ên jiyanê de kûr hatiye veşartin. Bendaveke lehiyê ya dorhêl hat derxistin, ku tê de qadeke 300 metre dirêj ji bo baxçe û xaniyên esnafan heye, û sûreke navxweyî ya dorhêl a parastinê ya 6.7 m stûr û 8 heta 10 metre bilind, ku bi bircên parastinê ve hatiye xurtkirin. Dîtinên din yek ji deriyên bajêr, kolanek ku ji navendê dest pê dike û li derî diqede, û xaniyên niştecîbûnê hene. Li navenda Mari girekî hebû, lê li wir tu perestgeh an qesr nehatine dîtin. Lêbelê avahiyek mezin hate kolandin (bi pîvanên 32 m x 25 m), ku xuya ye fonksiyonek îdarî hebû. Bingehên wê ji kevir û odeyên heta 12 metre dirêj û 6 metre fireh hebûn. Bajar di dora sala 2550 b.z. de di dawîya Serdema Xanedaniya Destpêkê II de, ji ber sedemên nenas, hate

terikandin (çav: Margueron, Jean-Claude (2003). "Mari and the Syro-Mesopotamian World". In Aruz, Joan; Wallenfels, Ronald (eds.). Art of the First Cities: The Third Millennium B.C. from the Mediterranean to the Indus. Metropolitan Museum of Art, p; 136).

Li dora destpêka Serdema Xanedaniya Destpêkê ya III (berî 2500 b.z) Mari ji nû ve hate avakirin û ji nû ve hate niştcehkirin. Bajarê nû gelek taybetmendiyên derveyî yê bajarê yekem parast, di nav de sûra hundirîn û derî. Her wiha bendava dorhêl a derve ya bi pîvana 1.9 km di firehiyê de hate parastin, ku bi dîwarekî du metre stûr ve hatibû xemilandin ku dikaribû tîrvanan biparêze (çav: Margueron, Jean-Claude (2003). "Mari and the Syro-Mesopotamian World". In Aruz, Joan; Wallenfels, Ronald (eds.). Art of the First Cities: The Third Millennium B.C. from the Mediterranean to the Indus. Metropolitan Museum of Art, pê, 136).

Lêbelê, avahiya hundirîn a bajarî bi tevahî hate guhertin û bajarê nû bi baldarî hate plansazkirin. Ya yekem kolanên ku ji navenda bilind ber bi derî ve dadiketin hatin çêkirin, da ku avên baranê werin rijandin (çav: Margueron, Jean-Claude (2003). "Mari and the Syro-Mesopotamian World". In Aruz, Joan; Wallenfels, Ronald (eds.). Art of the First Cities: The Third Millennium B.C. from the Mediterranean to the Indus. Metropolitan Museum of Art, p; 136).

Li navenda bajêr, qesreke keyî hate çêkirin ku di heman demê de wekî perestgehek jî xizmet dikir. Çar astên mîmarî yê li pey hev ji qesra keyenîya duyemîn hatine derxistin (ya herî kevin wekî P3 tê destnîşankirin, dema ku ya herî dawî wekî P0 ye). Du astên dawîn ji serdema Akadî ne. Du qatên pêşîn hatin kolandin; di nav van dîtinan de perestgehek ("Enceinte Sacrée" an jî dorpêça pîroz) heye ku ji bo yazdanekî nenas hatiye veqetandin, odeyeke textê ya bi stûn, û holeke bi sê stûnên darîn ên ducar ku ber bi perestgehê ve diçin hene (çav: Margueron, Jean-Claude (2003). "Mari and the Syro-Mesopotamian World". In Aruz, Joan; Wallenfels, Ronald (eds.). Art of the First Cities: The Third Millennium B.C. from the Mediterranean to the Indus. Metropolitan Museum of Art, pê 137).

Şeş perestgehên biçûktir li bajêr hatin keşifkirin, di nav wan de perestgeha bi navê Massif Rouge (veqetandina nenas), û perestgehên ku ji bo Ninni-Zaza [it] (INANA.ZA.ZA), Îştar, Ninhursag, û Şamaş hatine veqetandin. Ji bilî perestgeha Îştar, hemû perestgeh li navenda bajêr bûn; herêma di navbera "Enceinte Sacrée" û "Massif Rouge" de wekî navenda îdarî ya kahînê mezin tê hesibandin (çav: Margueron, Jean-Claude

(2003). "Mari and the Syro-Mesopotamian World". In Aruz, Joan; Wallenfels, Ronald (eds.). *Art of the First Cities: The Third Millennium B.C. from the Mediterranean to the Indus*. Metropolitan Museum of Art, p; 527).

Keyeniya duyem xuya dike ku navendeke ramyarî ya bihêz û geş bûye, keyên wê sernavê Lugal digirtin, û gelek ji wan di bajêr de têne şahidî kirin, çavkaniya herî girîng nameya key Enna-Dagan a nêzîkî 2350 b.z. ye, ku ji Irkab-Damu yê Ebla re hatiye şandin. Di wê de, keyê Mari behsa pêşiyên xwe û destkeftiyên wan ên leşkerî dike. Lêbelê, xwendina vê nameyê hîn jî ne diyar e û gelek şîrove ji hêla zanyaran ve hatine pêşkêş kirin (çav: Matthews, Victor Harold; Benjamin, Don C. (2006) [1994]. *Old Testament Parallels: Laws and Stories from the Ancient Near East* (3 ed.). Paulist Press. p; 261).

Keyê herî kevin ê ku di nameya Enna-Dagan de hatiye birhankirin Ansud e, ku tê de behsa êrîşkirina li ser Eblayê tê kirin, reqîbê kevneşopî yê Marî ku şerekî dirêj pê re hebû, û fetihkirina gelek bajarên Eblayê, tevî axa Belanê kiriya. Keyê din ê ku di nameyê de tê behs kirin Sa'umu ye, ku erdên Ra'ak û Nirumê fetih kir. Key Kun-Damu yê Eblayê di nîvê sedsala 25an a berî zayînê de Marî têk bir. Şer bi fetihkirina Emarê ji hêla Îşhtup-Işar ê Marî ve di dema qelsiya Eblayê de di nîvê sedsala 24an a berî zayînê de berdewam kir. Key Îgriş-Helam ê Eblayê neçar ma ku bacê bide Iblul-Il ê Marî, ku di nameyê de behsa wî tê kirin, gelek bajarên Eblayê fetih kir û li herêma Burmanê sefer kir (çav: Liverani, Mario (2013). *The Ancient Near East: History, Society and Economy*. Routledge, pê 119).

Enna-Dagan jî bac wergirt; serweriya wî bi tevahî ket bin serweriya Irkab-Damu yê Eblayê, ku karî Mari têk bibe û bacgirtinê bi dawî bîne. Mari di sala heftemîn a serokatiya wezîrê Eblayê Îbrîyûm de hevalbendê Eblayê Nagar têk bir, ev yek bû sedema astengkirina rêyên bazirganiyê di navbera Eblayê û Mezopotamyaya başûr de bi rêya Mezopotamyaya jorîn. Ev rêyên ku ew digihîştin herêmên lullubi û kassitên ber çîyayên zagrosan. Ku ew wê gûtiyê jî jî wê li wan serwer bin. Şer gihîşt zirweyê dema ku wezîrê Eblayê Îbî-Sîpîş bi Nagar û Kîş re hevpeymaniyek çêkir da ku Mari di şerekî nêzîkî Terqayê de têk bibe. Ebla bi xwe çend sal piştî Terqayê di dora sala 2300 b.z de, di dema serweriya keyê Mari Hidar de, yekem hilweşîna xwe dît. Li gorî Alfonso Archi, piştî Hidar Îşqî-Marî hate serweriya wî ku mohra keyî lê hate dîtin. Ew dûmenên şer nîşan dide, û dibe sedem ku Archi diyar bike ku ew berpirsiyarê

hilweşîna Eblayê ye dema ku hîn jî general bû (çav: Archi, Alfonso; Biga, Maria Giovanna (2003). "A Victory over Mari and the Fall of Ebla". *Journal of Cuneiform Studies*. 55. The American Schools of Oriental Research: 1–44, p: 33-35).

Tenê deh sal piştî wêrankirina Eblayê (li dora 2300 b.z., li gorî kronolojiya navîn), Mari bi xwe ji aliyê Sargonê Akad ve hate wêrankirin û şewitandin, wekî ku ji hêla yek ji navên salan ên wî ve tê xuya kirin ("Sala ku Mari tê de hate wêrankirin"). Michael Astour dîrok wekî nêzîkî 2265 b.z diyar kir (li gorî kronolojiya kurt). Ishqî-Marî dibe ku keyê dawîn ê Mari berî fetihkirina Împeratoriya Akad bû. Sargonê Akad ji Mari û Elamê bac berhev kir (çav: Frayne, Douglas. *Sargonic and Gutian Periods*. pp. 10–12).

Weki din di derbarê sefera sargon a li herêma de wê ev wê were gotin. "Sargon key li Tuttul li ber Dagan serê xwe tewand. Wî (Dagan) Axên Jorîn da wî (Sargon): Mari, Iarmuti, û Ebla, heta Daristana Sedar û Çiyayên Zîv"

Mari wek xanadanek kku ew weke ya lagashê, umma û hwd ku wê di demên kevntirin ên gûftiyan de jî wê weke xwediyê dîmenekê serweriyê bê. Di wê temenê de wê çendî ku ev demên wê zêde agahi di derbarê wan de wê di destê me de wê nebin jî lê wê dikarê wê bibêjê ku ew wê, xwediyê wê, serweriyê û wê rewşa xwe ya keyeni û desthilatî a li herêma bê. Ji çavkaniyên weke tîkiliya sargonê akadî û dagan didina diyarkirin wê fahmdikê ku wê, di wê demê de wê serweriyek berfireh a ramyari a mari wê di wê demê de wê hebê.

Marî berî ku ji aliyê keyê Akad Manishtushu ve were restorekirin, du nîşan hate terikandin. Waliyek ji bo rêvebirina bajêr hate tayînkirin ku sernavê Shakkanakku (waliyê leşkerî) li xwe digirt. Akad kontrola rasterast li ser bajêr digirt, ku ev yek bi tayînkirina du keçên xwe ji aliyê Naram-Sin ve ji bo karên kahîniyê li bajêr diyar e (çav: Astour, Michael C. (2002). "A Reconstruction of the History of Ebla (Part 2)". In Gordon, Cyrus Herzl; Rendsburg, Gary (eds.). *Eblaitica: Essays on the Ebla Archives and Eblaite Language*. Vol. 4. Eisenbrauns, p; 64).

Di serdema Akkadî de, endamê yekem ê xanedana Shakkanakku di navnîşan de Îdîdîş e, ku di dora sala 2266 b.z de hate tayînkirin. Li gorî navnîşan, Îdîdîş 60 salan hukum kir û kurê wî li şûna wî hate danîn, ev yek jî meqamê mîratî kir (çav: Leick, Gwendolyn (2002). *Who's Who in the Ancient Near East*. Routledge, p; 152).

Mariya dema sêyemîn ji hêla avahiya giştî ve li pey ya bajariya duyemîn hat, qonaxa P0 ya qesra keyeniyê ya kevin bi qesrek nû ji bo Shakkanakku hate guheztin. Qesrek din a piçûktir li rojhilatê bajêr hate çêkirin, û gorên keyeniyê yên ku dîroka wan vedigere serdemên berê dihewîne. Sûr ji nû ve hatin avakirin û xurtkirin, di heman demê de bendav veguherî dîwarekî parastinê ku firehiya wê gihîşt 10 metreyan. Deriyê pîroz ê berê hate parastin, perestgeha Ninhursag jî wisa bû. Lêbelê, perestgehên Ninni-Zaza û Îştarat winda bûn, di heman demê de perestgehek nû ya bi navê "perestgeha şêran" (ku ji bo Dagan hatibû veqetandin), ji hêla Shakkanakku Ishtup-Ilum ve hate çêkirin û bi wê ve girêdayî teraseke çargoşeyî hebû ku ji bo qurbanîyan 40 x 20 metre bû (çav: Margueron, Jean-Claude (2013). "The Kingdom of Mari". In Crawford, Harriet (ed.). *The Sumerian World*. Translated by Crawford, Harriet. Routledge, pê 530).

Akad di dema serweriya Şar-Kalî-Şarrî de hilweşiya, û Marî serxwebûna xwe bi dest xist, lê karhanîna sernavê Shakkanakku di serdema Xanedaniya Sêyemîn a Urê de berdewam kir. Prensêsa Marî bi kurê key Ur-Nammu yê Urê re zewicî, û Marî bi navê xwe di bin hegemonyaya Urê de bû. Lêbelê, vasaletiyê rê li ber serxwebûna Marî negirt, û hin Shakkanakku di nivîsên xwe yên sondxwarinê de sernavê keyî Lugal bikar hanîn, di heman demê de di nameyên xwe yên bi dadgeha Ur re sernavê Shakkanakku bikar hanîn. Xanedanî ji ber sedemên nenas ne demek dirêj berî damezrandina xanedaniya din, ku di nivê duyemîn ê sedsala 19-an a berî zayînê de pêk hat, bi dawî bû (çav: Frayne, Douglas (1990). *Old Babylonian Period (2003–1595 BC)*. The Royal Inscriptions of Mesopotamia Early Periods. Vol. 4. University of Toronto Press., p; 597).

Hezarsala duyem a berî zayînê li Nîvgirava Bereket bi berfirehbûna Amorîyan ve hate taybetmend kirin, ku bi serdestî û hukmê wan li piraniya herêmê gihîşt zirweyê, tevî Marî ku di dora sala 1830 berî zayînê de bû navenda xanedana Amorîyan a Lim di bin key Yaggid-Lim de. Lêbelê, birhanên epîgrafîk û arkeolojîk rêjeyek bilind a berdewamiyê di navbera serdema Shakkanakku û Amorîyan de nîşan dan (çav: Wossink, Arne (2009). *Challenging Climate Change: Competition and Cooperation Among Pastoralists and Agriculturalists in Northern Mesopotamia (c. 3000–1600 BC)*. Sidestone Press, p; 31).

Yaggid-Lim berî ku xwe li Marî bicîh bike, hukumdarê Suprum bû, wî bi Ila-kabkabu yê Ekallatum re hevalbendiyek çêkir, lê têkiliyên di

navbera her du monarşan de veguherî şerekî vekirî. Nakokî bi girtina mîratgirê Yagîd-Lîm, Yahdûn-Lîm, ji aliyê Îla-kabkabû ve bi dawî bû û li gorî tabletek li Mari hat dîtin, Yagûd-Lîm ê ku ji Îla-kabkabû sax ma, ji aliyê xulamên xwe ve hat kuştin. Lêbelê, di dora sala 1820 b.z de, Yahdûn-Lîm wekî keyê Mari bi tundî desthilatdar bû (çav: Frayne, Douglas (1990). *Old Babylonian Period (2003–1595 BC)*. The Royal Inscriptions of Mesopotamia Early Periods. Vol. 4. University of Toronto Press, p; 601).

Yahdûn-Lîm dest bi serweriya xwe kir bi bindestkirina heft serokên eşîrên xwe yên serhildêr û ji nû ve avakirina dîwarên Mari û Terqa, digel avakirina kelehê nû ku wî navê Dur-Yahdûn-Lîm lê kir. Piştî wî ber bi rojava ve berfireh bû û îdia kir ku gihîştîye Deryaya Navîn, lêbelê paşê ew neçar ma ku bi serhildanek ji hêla koçberên Yamînî ve rû bi rû bimîne ku li Tuttul navendî bûn, û serhildêr ji hêla keyê Yamhad Sumu-Epuh ve hatin piştgirî kirin, ku berjewendiyên wî ji ber hevpeymaniya nû ya di navbera Yahdûn-Lîm û Eşnunna de di bin gefê de bûn. Yahdûn-Lîm Yamîniyan têk bir lê şerekî vekirî bi Yemhadê re nehat dîrxistin, ji ber ku keyê Mari bi reqabeta xwe ya bi Şemşî-Adad I yê Shubat-Enlîl, kurê Îla-kabkabû re mijûl bû. Şer bi têkçûna Mari bi dawî bû, û Yahdûn-Lîm di dora sala 1798 b.z de ji hêla kurê wî yê muhtemel Sumu-Yamam ve hate kuştin, ku ew bi xwe du sal piştî ku li ser text hilkişîya dema ku Şemşî-Adad pêşve çû û Mari dagir kir, hate kuştin (çav: Bryce, Trevor (2014). *Ancient Syria: A Three Thousand Year History*. Oxford University Press., p; 20).

Şemşî-Edad (1809-1775 b.z) kurê xwe Yasma-Edad li ser textê Mari tayîn kir, keyê nû bi keça Yahdûn-Lîm re zewicî, di heman demê de yên mayî yên malbata Lîm li Yemhadê penaber bûn, û girêdana xakê bi fermî bi tiştên ku Şemşî-Edad wekî kiryarên gunehkar ên li aliyê malbata Lîm dihesiband re hate rewakirin. Ji bo ku pozîsyona xwe li dijî dijminê xwe yê nû Yemhadê xurt bike, Şemşî-Edad Yasma-Edad bi Betlum, keça Îşî-Eddu ya Qatnayê re zewicî. Lêbelê, Yasma-Edad bûka xwe paşguh kir û bû sedema krîzek bi Qatnayê re, û ew wekî rêberek bêkêr derket holê û bû sedema hêrsa bavê wî ku di dora sala 1776 b.z. de mir, di heman demê de ku artêşên Yarim-Lîm I ya Yemhadê ji bo piştgiriya Zimrî-Lîm, mîratgirê xanedana Lîm, pêşve diçûn (çav: Hamblin, William J. (2006). *Warfare in the Ancient Near East to 1600 BC*. Routledge, p; 258).

Her ku Zimrî-Lîm pêşve diçû, serokê Sim'aliyan (eşîra Zimrî-Lîm) Yasmah-Adad hilweşand, rê ji bo Zimrî-Lîm vekir ku çend meh piştî

revîna Yasmah-Adad gihîşt wir, û demek kurt piştî ku di dora sala 1776 b.z. de li ser textê xwe rûnişt, bi prenses Şibtû re zewicî, keça Yarim-Lîm I. Hilkişîna Zimrî-Lîm bo ser text bi alîkariya Yarim-Lîm I bandûr li ser rewşa Mari kir, Zimrî-Lîm Yarim-Lîm wekî bavê xwe bi nav kir, û keyê Yemhadî karî Mari wekî navbeynkar di navbera yazdanê sereke yê Yemhad, Hadad, û Zimrî-Lîm, ku xwe wekî xulamê Hadad îlan kir, ferman bide (çav: Malamat, Abraham (1980). "A Mari Prophecy and Nathan's Dynastic Oracle". In Emerton, John Adney (ed.). *Prophecy: Essays presented to Georg Fohrer on his Sixty-Fifth Birthday*. Beihefte zur Zeitschrift für die Alttestamentliche Wissenschaft. Vol. CL. Walter de Gruyter. p; 75).

Yekem wêrankirin nêzîkî sala 2300 berî zayînê pêk hat; qesra "G" hate şewitandin, tabletên axê yên arşîvên keyenî hatin pijandin û ew hatin parastin. Gelek teorî li ser sedem û sûcdar hatine diyarkirin (çav: Biga, Maria Giovanna (2014). "Inherited space – third millennium political and cultural landscape". In Cancik-Kirschbaum, Eva; Brisch, Nicole; Eidem, Jesper (eds.). *Constituent, Confederate, and Conquered Space: The emergence of the mittani state*. Walter de Gruyter., p; 103):

Hîpoteza dîroka bilind (destpêk): Giovanni Pettinato piştgirî dide dîrokeke zû ji bo Ebla ku wêrankirinê li dora 2500 b.z destnîşan dike. Pettinato, her çend dîroka 2500 b.z tercîh bike jî, paşê qebûl kir ku bûyer di sala 2400 b.z de qewimîbe. Zanyar diyar dikin ku bajar di sala 2400 b.z de ji hêla Mezopotamyayîyekê wekî Eannatum ê Lagaşê - ku pesnê xwe dida ku ji Mari bacê distîne - an Lugalzagesi yê Umma, ku îdîa dikir ku gihîştîye Deryaya Navîn, hatiye wêrankirin.

Hîpoteza Akadî: Her du keyên Sargon ê Akadê û neviyê wî Naram-Sin îdîa kirin ku bajarekî bi navê Ibla wêran kirine, Vedîtinkarê Eblayê, Paolo Matthiae, Sargon wekî sûcdarekî muhtemeltir dibîne; nêrîna wî ji hêla Trevor Bryce ve tê piştgirî kirin, lê ji hêla Michael ve tê red kirin.

Fetihkirina Armanum û Ebla li perava Deryaya Spî ji aliyê Naram-Sin ve di gelek nivîsên wî de tê behskirin (çav: Frayne, Douglas. Sargonic and Gutian Periods. pp. 132–133).

"Digel ku, ji dema afirandina mirovahiyê ve, tu keyê ku Armanum û Ebla wêran nekiribe, yazdanê Nergal, bi çekên xwe rê li ber Naram-Sin, yê bi hêz, venekiriye û Armanum û Ebla nedaye wî. Wekî din, wî Amanus, Çiyayê Sedar û Deryaya Jorîn dane wî. Bi çekên yazdanê Dagan, yê ku keyeniya wî bilind dike, Naram-Sin, yê bi hêz, Armanum û Ebla fetih kiriye." (çav: Frayne, Douglas. Sargonic and Gutian Periods. pp. 132–133).

Rewşa abla ji wê aliyê ve wê di çerçoveya serdema gûtîyan de wê weke minaqek teybet bê. Di wê temenê de wê, di derbarê serdema wê de wê, têtikiya gûtîyan bi akadê û an ya bi akadê û bi abla re wê di wê temenê de wê karibê wê dest nişan bikê. Di wê temenê de wê dikarê di wê nûqteyê de hipotezek din jî wê pêşbixê ku wê abla wê weke ku wê li gelek herêmên bakûrê mesopotamya serwer bûna û akadê xwediya ku wê desthilatiya gûtîyî derbas bikê. Di wê de wê gelek keyeniyên piçûk ku ew simitîkî jî wê hebin. Mari yek ji wan bê ku wê piştî mazin û serwer bibê. Di wê demê de wê, li hemberê wê, weke hewldanên keyê akadê ê li ser mari re wê weke leyistina li nakokiya nava abla û mari re wê bileyîzê wê, di dîmenekê de wê xwe bide diyarkirin. Di wê nûqteyê de wê, piştî wê, wêrankirina abla û demek kin serwerîya mari a piştî wê weke ku wê rastiyê piştastbikê. Lê di wê nûqteyê de wê, rewşa mari jî wê ji wê aliyê ve wê, têtiki û wûcana xwe re wê ne di zelaliyê de bê.

Li gorî Alfonso Archi û Maria Biga, wêranî bi qasî sê an çar sal piştî şerê Terqa qewimî. Archi û Biga dibêjin ku wêranî ji hêla Mari ve hatiye çekirin ji bo tolhildana têtikûna wê ya şerê li Terqa. Ev nêrîn ji hêla Mario Liverani ve tê piştgirî kirin. Archi dibêje keyê Mari Isqi-Mari berî ku li ser textê bajarê xwe hilkişe Ebla wêran kir (çav: Liverani, Mario (2013). *The Ancient Near East: History, society and economy*. Routledge, p; 123).

Lê ku em vê teoriya Archi û Biga wê herê bikin wê demê em divê ku hinek pêjnên din ên bi fêrsên fahmkirinê tevli mijarê bikin. Weke têtikiya mari a bi akadê û hewldana çekirina tifaqekê bi derfet. Ku ev bûbê û akadê piştî dabê wê demê wê bi alikariya akadê wê weke serwerîya xwe bi şerekê li hemberê abla wê kiribê. Di wê demê de wê, ev rewş wê weke rewşek din a teybet wê xwe bide diyarkirin.

Astour dibêje ku karesatek xwezayî bûye sedema şewatê ku dawîya serdema arşîvê hanî. Ew dibêje ku wêranî bi qada qesra keyenî ve sînorkirî bû û ti birhanên piştrast ên talankirinê tune ne. Ew agir vedigerîne dora 2290 b.z. (li gorî kronolojiya Navîn) (çav: Astour, Michael C. (2002). "A Reconstruction of the History of Ebla (Part 2)". In Gordon, Cyrus Herzl; Rendsburg, Gary (eds.). *Eblaitica: Essays on the Ebla Archives and Eblaite Language*. Vol. 4. Eisenbrauns, p; 75).

Serdema keyeniya duyemîn wekî "Mardikh IIB2" tê binavkirin, û serdema di navbera 2300 û 2000 b.z de digire nav xwe. Keyeniya duyem heta hilweşîna duyem a Eblayê dom kir, ku di navbera salên 2050 û 1950 berî zayînê de qewimî, û dîroka wê ya 2000 berî zayînê tenê dîrokek fermî ye. Akadîyan di bin femandariya Sargonê Akad û neviyên wî Naram-Sin de sînorên bakur ên Eblayê dagir kirin û armanc kirin daristanên Çiyayê Amanus; destwerdan bi qasî 90 salan ji hev dûr bûn û deverên ku hêriş lê hatine kirin ne girêdayî Akadê bûn. Archî qebûl dike ku Îblaya ku di salnameyên Sargon û Naram-Sin de behsa wê tê kirin, Eblaya rojavayê kurdistanê a gûtfîyan a, lê wan wekî berpirsiyarê hilweşîna ku serdema Arşîvê bi dawî kir nabîne. Di dema Naram-Sin de, Armi bajarê hegemonîk li rojavayê kurdistanê bû û ji hêla keyê Akad ve hate hilweşandin (çav: Archî, Alfonso (2015). *Ebla and Its Archives: Texts, History, and Society*. Walter de Gruyter., p; 471).

Xanedaniyek nû ya herêmi keyeniya duyem a Eblayê piştî hukûm kir, lê bi mîrata keyeniya wê ya yekem re berdewamî hebû. Ji çavkaniyên wê yên ku em zêde ne xwediyê zanînê li wê ne wê, weke ya ji demên gûtfîyan bê. Ebla taybetmendiyên xwe yên herî kevn, tevî şewaza xwe ya mîmarî û pîroziya cihên olî yên keyeniya yekem, parast dikê. Qesreke keyenî ya nû li bajarokê jêrîn hate çêkirin, û derbasbûna ji serdema arşîvê tenê bi hilweşandina qesra "G" tê nîşankirin. Derbarê keyeniya duyem de hindik tişt tene zanîn ji ber ku ji bilî nivîsek ku dîroka wê vedigere dawîya serdemê, ti materyalên nivîskî nehatine keşîf kirin (çav: Astour, Michael C. (2002). "A Reconstruction of the History of Ebla (Part 2)". In Gordon, Cyrus Herzl; Rendsburg, Gary (eds.). *Eblaitica: Essays on the Ebla Archives and Eblaite Language*. Vol. 4. Eisenbrauns., p; 74).

Keyeniya duyem di çavkaniyên hevdem de hatiye birhankirin; di nivîsekê de, Gudea yê Lagaşê xwest ku darên sedir ji Urşu li çiyayên Eblayê werin hanîn, ku nîşan dide ku axa Ebla Urşu li bakurê Karkemişê li bakûrê kurdistanê îroyîn dihevine. Nivîsên ku dîroka wan vedigere sala heftemîn a Amar-Sin (li dora 2040 b.z), hukûmdarê împaratoriya Ur

III, behsa qasidê Ensî ("Megum") ê Ebla dikin. Keyeniya duyem ji aliyê hikûmdarê Ur III ve wekî vasal dihat hesibandin, lê cewherê têkiliyê nayê zanîn û dayîna bacê jî di nav xwe de digirt. Naskirina fermî ya serweriya Ur xuya dike ku şertek jî bo mafê bazirganiyê bi wê împaratoriye re ye (çav: Astour, Michael C. (2002). "A Reconstruction of the History of Ebla (Part 2)". In Gordon, Cyrus Herzl; Rendsburg, Gary (eds.). *Eblaitica: Essays on the Ebla Archives and Eblaite Language*. Vol. 4. Eisenbrauns.p; 101).

Keyeniya duyem ber bi dawiya sedsala 21-an a beriya zayinê ve hilweşiya, û bi wêrankirina bajêr bi agir bi dawî bû, her çend birhanên bûyerê tenê li derveyî "Perestgeha Kevir" û li herêma li dora qesra "E" ya li ser akropolê hatine dîtin. Sedema wêrankirinê nayê zanîn; li gorî Astour, dibe ku encama dagirkirina Hûriyan be di dora ... de. 2030 b.z, bi pêşengiya bajarê berê yê bindest ê Eblayê, Ikinkalis. Wêrankirina Eblayê di destana efsanewî ya Hurro-Hîtî "Strana Rizgarkirinê" ya perçekirî de ku di sala 1983an de hatiye keşîfkirin, tê behskirin, ku Astour wê wekî wêrankirina keyeniya duyemîn dibîne. Di destanê de, civînek Eblayê ya bi pêşengiya zilamekî bi navê "Zazalla" rê li ber key Meki digire ku dilovaniyê li girtiyên bindestê berê yê Eblayê, Ikinkalis, bike, û xezeba yazdanê bahozê yê Hûrî Teshub derdixe holê û dibe sedem ku ew bajar wêran bike (çav: Bachvarova, Mary R. (2009). "Manly Deeds: Hittite Admonitory History and Eastern Mediterranean Didactic Epic". In Konstan, David; Raaflaub, Kurt A. (eds.). *Epic and History*. John Wiley & Sons.p; 67).

Keyeniya sêyem wekî "Mardikh III" tê binavkirin; ew di navbera serdemên "A" (nêzîkî 2000–1800 b.z) û "B" (nêzîkî 1800–1600 b.z) de dabeş dibe. Di serdema "A" de, Ebla bi lez wekî bajarekî plansazkirî ji nû ve hate avakirin. Bingeh bermahiyên Mardikh II vedişartin; qesr û perestgehên nû hatin çêkirin, û kelehên nû di du çemberan de hatin çêkirin - yek ji bo bajarê nîzm û yek ji bo akropolê. Bajar li ser xetên rêkûpêk hate danîn û avahiyên giştî yên mezin hatin çêkirin. Avakirina din di serdema "B" de pêk hat.(çav: Harmanşah, Omûr (2007). "Upright Stones and Building Narratives: Formation of a Shared Architectural Practice In the Ancient Near East". In Cheng, Jack; Feldman, Marian H. (eds.). *Ancient Near Eastern Art in Context*. Brill. p. 75).

Yekem keyê naskirî yê keyeniya sêyem Ibbit-Lim e, ku xwe wekî Mekimê Eblayê bi nav kir. Peykerê bazalt ê ku nivîsa Ibbit-Lim li ser e di sala 1968an de hate keşîfkirin; Ev yek alîkarî kir ku cihê Tell-Mardikh bi

keyeniya kevnar Ebla ve were nas kirin. Li gorî Pettinato, navê key Amorî ye; ji ber vê yekê mimkun e ku niştecihên keyeniya sêyemîn Ebla bi piranî Amorî bûn, wekî piraniya niştecihên rojavayê kurdistanê di wê demê de (çav: Pettinato, Giovanni (1991). *Ebla, a new look at history*. Johns Hopkins University Press, p; 22).

Di destpêka sedsala 18an a berî zayînê de, Ebla bû vasalê Yemhadê, keyeniyek Amorî ya navenda wê li Helebê bû. Lê ev dem çendî ku wê rengê pênasekirina zêde ne zalel ji bê lê bi gotinên bi wê yekê û rengê dihên herêkirin ku mirov binerê wê karibê bibêjê ku ew dem kin dikişênê. Qeydên nivîskî ji bo vê serdemê tune ne, lê bajar hîn jî di dema Yarim-Lim III ya serweriya Yemhadê de vasal bû. Yek ji hukumdarên naskirî yên Eblayê di vê serdemê de Immeya bû, ku ji Fîrawnê Misirî Hotepibre diyariyan wergirt, ku nîşan dide ku têkilî û girîngiya berdewam a Eblayê heye. Bajar di tabletên bajarê vasal ê Yemhadî Alalaxê li bakûrê kurdistana îroyîn de hatiye behs kirin; Prensesa Eblaî bi kurê key Ammîtaqum ê Alalaxê re zewicî, ku ji şaxek ji xanedana keyeniya Yamhadî bû (çav: Frayne, Douglas (1990). *Old Babylonian Period (2003–1595 BC). The Royal Inscriptions of Mesopotamia Early Periods*. Vol. 4. University of Toronto Press, p; 807).

Ebla di dora sala 1600 b.z de ji aliyê keyê Hîtî Mursili I ve hate wêrankirin. Indilimma dibe ku keyê dawî yê Eblayê be; mohra prensê tac ê wî Maratewari li qesra rojava "Q" hate dîtin. Wekî din, li gorî Archi, Maratewari dikare keyê dawî be, ku her wiha argûman kir ku destana "Strana Rizgarkirinê" wêrankirina keyeniya sêyemîn vedibêje û hêmanên kevintir diparêze (çav: Archi, Alfonso (2002). "Formation of the West Hurrian Pantheon: The Case Of Ishara". In Yener, K. Aslihan; Hoffner, Harry A.; Dhesi, Simrit (eds.). *Recent Developments in Hittite Archaeology and History*. Eisenbrauns, p; 24).

Ebla ji wêrankirina xwe ya sêyemîn qet sax nebû. Ew gundekî biçûk bû di qonaxa ku wekî "Mardikh IV" (1600–1200 b.z) dihat binavkirin, û di tomarên Alalaxê de wekî vasalekî xanedana Îdrîmî dihat behskirin. "Mardikh V" (1200 b.z) wargehek gundewarî ya Serdema Hesin a Destpêkê bû ku di serdemên paşîn de mezin bû. Pêşveçûnek din di dema "Mardikh VI" de çêbû, ku heta dora 60 p.z dom kir. "Mardikh VII" di sedsala 3-an a p.z de dest pê kir û heta sedsala 7-an dom kir, piştî wê cih hate terikandin (çav: Hooks, Stephen M. (1990). "Ebla". In Mills, Watson E.; Bullard, Roger Aubrey; Drinkard, Joel F. Jr.; Harrelson, Walter; McKnight, Edgar V.; Armour, Rollin Stely; Rowell, Edd; Wilson,

Richard F. (eds.). Mercer Dictionary of the Bible. Mercer University Press.p; 225).

Ebla ji bajarekî jêrîn û akropolek bilindkirî li navendê pêk dihat. Di dema keyeniya yekem de, bajar 56 hektar rûber hebû û bi kelehên ji kerpîçên heriyê dihat parastin. Ebla ji çar navçeyan pêk dihat - her yek bi deriyekî xwe di dîwarê derve de. Akropol qesra key "G" dihevwîne, û yek ji du perestgehên li bajêr ên ji bo Kura hatine veqetandin (bi navê "Perestgeha Sor") Bajare jêrîn perestgeha duyemîn a Kura li başûrê rojhilat dihevwîne ku jê re "Perestgeha Kevir" digotin. Di dema keyeniya duyem de, qesrek keyenî (qesra arkaîk "P5") li bajarokê jêrîn li bakurê rojavayê akropolê hate çêkirin, ji bilî perestgeha "D" ku li ser "Perestgeha Sor" a wêrankirî hatiye çêkirin (çav: Matthiae, Paolo (2013a). "A Long Journey. Fifty Years of Research on the Bronze Age at Tell Mardikh/Ebla". In Matthiae, Paolo; Marchetti, Nicolò (eds.). Ebla and its Landscape: Early State Formation in the Ancient Near East. Left Coast Press.p; 40).

Di dema keyeniya sêyem de, Ebla bajarekî mezin bû ku nêzikî 60 hektar mezin bû, û bi sûrek bi hêz, bi deriyên du odeyên cuda ve dihat parastin. Akropolis hate xurtkirin û ji bajare jêrîn veqetiya. Qesra keyeniyê ya nû "E" li ser akropolê hate avakirin (di dema Mardikh IIIB de), û perestgehek Îştâr li ser perestgehên berê yê "Sor" û "D" hate çêkirin (li herêma "D"). Bajare jêrîn ji li çar navçeyan hate dabeş kirin; qesra "P5" di dema Mardikh IIIA de hate bikar hanîn, û di dema Mardikh IIIB de bi "Qesra Navîn" hate guhertin (çav: Bonacossi, Daniele Morandi (2013). "Northern Levant (Syria) During the Middle Bronze Age". In Steiner, Margreet L.; Killebrew, Ann E. (eds.). The Oxford Handbook of the Archaeology of the Levant: c. 8000-332 BCE. Oxford University Press.p; 421).

Avahiyên din ên keyeniya sêyemîn qesra vîzer, qesra rojava (li herêma "Q"), perestgeha Şamaş (perestgeha "N"), perestgeha Rasapê (perestgeha "B1") û qesra bakur (li ser "Qesra Navîn" hatî çêkirin) bûn. Li bakurê bajarokê jêrîn, perestgeheke duyemîn ji bo Îştârê hate avakirin, di heman demê de "Perestgeha Kevir" a berê bi perestgeheke Hedad hate guhertin (çav: Nigro, Lorenzo (2007). Byblos and Jericho in the Early Bronze I: Social Dynamics and Cultural Interactions: Proceedings of the International Workshop Held in Rome on March 6th 2007 by Rome "La Sapienza" University. Lorenzo Nigro.p; 130).

Keyên keyeniya yekem li derveyî bajêr hatine veşartin; deh keyên dawîn (bi Irkab-Damu diqede) li "daribê" hatine veşartin, di heman demê de keyên kevintir di goristaneke keyenî ya li "binasê" de hatine veşartin û tenê goristaneke keyenî ya ku dîroka wê vedigere keyeniya yekem li Eblayê hatiye dîtin (Hypogeum "G4").[Ev goristana keyeniya yekem bi îhtîmaleke mezin di dema serdestiya keyê dawîn de hatiye çêkirin û dibe ku nîşanek be ku Eblai kevneşopiyên Mezopotamyayê ji bo veşartina keyan di bin qesrên wan ên keyenî de bikar haniye (Çav: Matthiae, Paolo (2013). "The Royal Palace. Functions of the Quarters and the Government of the Chora". In Matthiae, Paolo; Marchetti, Nicolò (eds.). *Ebla and its Landscape: Early State Formation in the Ancient Near East*. Left Coast Press, p; 50).

Nekropola keyeniya sêyem di bin qesra "Q" (qesra rojava) de hatiye dîtin; gelek hîpogea tê de hene lê tenê sê hatine kolandin. Ew gor şikeftên xwezayî di bingeha qesrê de bûn; ew hemî dîroka wan vedigere sedsalên 19 û 18 berî zayînê û planeke wekhev hebû ku ji şafteke ketinê, odeyên veşartinê û dromosek pêk dihat ku şaftê bi odeyê ve girêdide (çav: Dolce, Rita (2010). "Ebla and its origins – a proposal". In Matthiae, Paolo; Pinnock, Frances; Nigro, Lorenzo; Marchetti, Nicolò; Romano, Licia (eds.). *Proceedings of the 6th International Congress of the Archaeology of the Ancient Near East: Near Eastern archaeology in the past, present and future: heritage and identity, ethnoarchaeological and interdisciplinary approach, results and perspectives; visual expression and craft production in the definition of social relations and status*. Vol. 1. Otto Harrassowitz Verlag, p; 252).

Ev kevneşopîya veşartinê wê têgînek din a weke ya dema gûtîyan de wê were dîtin wê weke bi xwe re wê bide diyarkirin. Ev bi têgîna 'parastgeha binêardê' ya ku wê di wê de wê weke ku wê werina bicihkiriin bê. Ev di çanda enki de jî wê hebê. Û di rengekê din de jî wê, weke têgînek ku wê bi ber binêardê ve wê, kûrbûnê wê di wê temenê de wê, di temenekê di wê de wê weke karibin bijin jî wê were dîyarkirin. Li hin deverên rojavayê kurdistanê û bakûrê kurdistanê ên weke girê-miraza' kifşkirinên di wê temenê de hatina kirin wê di rengekê de wê, çandê wê di şêwayekê de wê weke ku wê bi xwe re wê weke bide diyarkirin.

Minaq gora keyene ya ku di qesra keyene de hatiye dîtin "G" wekî hîpogeu "G4" tê binavkirin; ew vedigere serdema arşîvê, bi îhtîmaleke mezin serdema serweriya Isar-Damu. Gor pir zirar dîtiye; piraniya

kevirên wê hatine talankirin û ji sîstema banê tiştek nemaye. Her weha ti bermahiyên hestî an tiştên cenazeyê tê de tune ne ku nîşan didin ku ew bi giranî hatiye talankirin, qet nehatiye bikar hanîn, an jî wekî "cenotaf" hatiye çêkirin (çav: Laneri, Nicola (2016). "Embodying the memory of the royal ancestors in western Syria during the third and second millennia BC: The case of Ebla and Qatna". In Nadali, Davide (ed.). *Envisioning the Past Through Memories: How Memory Shaped Ancient Near Eastern Societies. Cultural Memory and History in Antiquity. Vol. 3.* Bloomsbury., p; 56).

Di navbera salên 1992 û 1995an de hatiye kolandin, ew di bin sektora rojava ya qesrê de di kûrahiya nêzîkî 6 metreyan de ye. Gor ji du odeyan pêk tê ku li ser hev bi erdên gêçê lîmê vekirî ne. Her du ode jî bi şîklê çargoşeyî ne; odeya rojhilat (L.6402) 4 metre fireh e, ji 3,5 metreyan dirêjtir e (dirêjahiya giştî ji ber zirara giran nayê zanîn) û ber bi rojava-rojhilat ve ye. Odeya rojava (L.5762) 5.20 metre dirêj, 4 metre fireh û ber bi rojava-rojhilat ve ye. Ji bo çêkirina dîwaran kevirê kilsinî hatiye bikarhanîn û çend blokên ku ji aliyan ve ber bi navenda odeyan ve derdikevin nîşan didin ku banê wê kemerek bi kerbel bû (çav: Laneri, Nicola (2016). "Embodying the memory of the royal ancestors in western Syria during the third and second millennia BC: The case of Ebla and Qatna". In Nadali, Davide (ed.). *Envisioning the Past Through Memories: How Memory Shaped Ancient Near Eastern Societies. Cultural Memory and History in Antiquity. Vol. 3.* Bloomsbury., p; 56).

Gor di bin erdê Avahiya Q de hatin dîtin, ku di serdema Isin-Larsa de hatiye çêkirin. Minaq gora prensesê: dîroka wê vedigere dora sala 1800 berî zayînê, ew gora herî kevin û piçûk a keyeniya sêyemîn e ku hatiye dîtin. Di sala 1978an de hatiye kolandin, tê de bermahiyên jineke ciwan hebûn, ji ber vê yekê nav lê hatiye kirin. "Dromos" xwedî pileyên ku qismî di zinaran de hatine birîn û qismî bi keviran hatine çêkirin e, ku ber bi odeyê ve diçin, ku bi riya mezinkirina şikeftê xwezayî hatiye bidestxistin. Gor tenê gor e ku nehatiye talankirin; tê de zêrên hêja û tiştên cenazeyê hebûn (çav: Grajetzki, Wolfram (2013). *Tomb Treasures of the Late Middle Kingdom: The archaeology of female burials.* University of Pennsylvania Press, p; 173).

Gora sîsternan: ev gor di nekropolê de ya herî zirardar e. Ew ji defînkirinek odeyek duqat pêk tê; ya herî kevin, (Q79A), di heman serdema gorra prensesê de hatiye çêkirin, û dema ku gor ji nû ve hatiye bikarhanîn gelek zirar dîtiye, û dromosek li cihê Q79A ber bi dawiya

sedsala 17an berî zayînê ve hatiye çêkirin (ku bûye sedema damezrandina gorra Q79B). Ev dibe ku cihê bêhnvedanê yê keyeekî be; darek (sembola hêza keyenî) di Q79A de hatiye keşîfkirin (çav: Nigro, Lorenzo (2009). Doumet-Serhal, Claude (ed.). "The eighteenth century BC princes of Byblos and Ebla and the chronology of the Middle Bronze Age". Bulletin d'Archéologie et d'Architecture Libanaises. Hors-Série VI (Interconnections in the Eastern Mediterranean: Lebanon in the Bronze and Iron Ages: Proceedings of the International Symposium Beirut 2008). Beyrouth: Ministère de la Culture, Direction Générale des Antiquités., p; 161).

Gora keyê bizinan(goat king): ew ya herî mezin a nekropolê ye; du odayên danînê dihewîne û bi rêya şaftek vertîkal tê gihîştinê. Niştecihê gorê bi teqezî nayê zanîn, ji hêla arkeologan ve ew wekî 'keyê bizinan' tê binavkirin ji ber hebûna textek ku bi serên bizinên sifirê (bronzê) di gorê de hatiye xemilandin. Qedehek zîv ku navê key Immeya li ser hatiye nivîsandin di gorê de hatiye dîtin, ku ev yek wî keyî dike xwediyê gorê yê herî muhtemel (çav: Matthiae, Paolo (2010). Ebla: la città del trono: archeologia e storia. Piccola biblioteca Einaudi: Arte, architettura, teatro, cinema, música (in Italian). Vol. 492. Einaudi., p; 217).

Hikûmdariya keyeniya yekem ji key (bi navê Malîkûm) û wezîrê mezin pêk dihat, ku serokatiya encûmenek mezinan (Ebbû) û rêveberiyê dikir. keyeniya duyem jî monarşî bû, lê ji ber nebûna tomarên nivîskî kêmtir li ser wê têne zanîn. Keyeniya sêyem monarşîyek bajar-dewlet bû ku di bin desthilatdariya Yemhad de girîngiya wê kêmtir bû (çav: Hamblin, William J. (2006). Warfare in the Ancient Near East to 1600 BC. Routledge, p; 267).

Şahbanû rêvebirina karûbarên dewletê bi key re parve dikir. Mîr tacê di karûbarên navxweyî de û Mîrê duyem jî di karûbarên derve de beşdar bû. Piraniya erkên wî, tevî yên leşkerî, ji hêla wezîrê û rêveberiyê ve dihatin kirin, ku ji 13 rûmetdarên dadgehê pêk dihat - her yek ji wan di navbera 400 û 800 mêran de kontrol dikir û burokrasiyek bi 11,700 kesên ava dikir. Her yek ji çar taxên bajarê jêrîn ji hêla mufetîşek sereke û gelek cîgirên ve dihat rêvebirin. Ji bo çavdêriya berjewendiyên keyene, keyah sixor (meşkim), berhevkar (ur) û peyamnêr (kas) dixebitand (çav: Hamblin, William J. (2006). Warfare in the Ancient Near East to 1600 BC. Routledge, p; 242).

Di warê dabeşkirinên îdarî de jî wê ev rewş wê were dîtin. Gelek keyeniyên muwekîl dilsozê Ebla bûn û her yek ji hêla keyê xwe (En) ve

dihat birêvebirin; ew keyên vasal pir xweser bûn, bac didan û alîkariya leşkerî didan Eblayê. Navenda îdarî ya li paytextê wekî "SA.ZA" dihat binavkirin; ew qesrên keyene, depo û hin perestgeh dihewîne. Herêmên li derveyî dîwarên paytextê di nivîsên Eblayê de bi hev re wekî "uru-bar" (bi rastî tê wateya derveyî bajêr, yan di zimanê roja me de wê weke "dûrûber." bi wateya herêmên derve ên bi serê xwe.) dihatin binavkirin. Gund û bajarokên di bin desthilatdariya navendî de an rasterast ji paytextê dihatin birêvebirin, an jî karbidestên tayînkirî hebûn. Sernavên karmendên sivîl berpirsiyarî û desthilatdariya xwediyê belgeyê bi zelalî diyar nakin ji ber ku her bajarok kevneşopiyên xwe yên ramyarî hebûn (çav: Cooper, Lisa (2006). *Early Urbanism on the Syrian Euphrates*. Routledge., p; 91).

Lugal ku ew bi wateya key bê, dema ku li Mezopotamyayê lugalek key destnîşan dikir, li Eblayê wê parêzgarek destnîşan dikir ku rasterast di bin desthilatdariya paytextê de bû. Cewhera vê sernavê wekî beşek ji burokrasiya Eblaî nezêl e; her lugal di bin desthilata wezîrê mezin de bû, û hilgîrên wê bajarên ku rasterast di bin desthilata paytextê de bûn, birêve dibirin û hemî kelûpel dianîn da ku di depoyên Eblayê de werin hilanîn. Pettinato di metnên îdarî yên Eblaî de 14 lugalên cûda jimart û encam da ku keyenî ji çardeh beşan pêk tê; du ji wan di paytextê de bûn û diwanzdehên mayî jî tevahiya keyeniyê digirtin nav xwe.

Mînaq navê "ugula" wek sernav wekî serpereşt tê wergerandin; hin ugula serdestên serbixwe bûn û hin jî desthilatdariya herî bilind a komeke eşîrî numînêr dikirin. An jî wek elîtek rêveber û bi hêz ku ew xwediyê hêz û erkên paya bilind bin. Gelek bajaran ugulayek wekî serokê rêveberiyê destnîşan kiribûn, wekî bajarê Darum (çav: Biga, Maria Giovanna (2013). "Defining the Chora of Ebla : A textual perspective". In Matthiae, Paolo; Marchetti, Nicolò (eds.). *Ebla and its Landscape: Early state formation in the ancient Near East*. Left Coast Press., p; 265).

Herêmên di bin kontrola rasterast a key de ku ji bo paytextê ji hêla aborî ve girîng bûn, ji hêla arkeologan ve wekî "chora" têne binavkirin. Herêmên di bin kontrola rasterast a key de ji derveyî chora dirêjtir dibûn û ji ber berfirehbûna leşkerî ya domdar a Eblayê ku deverên nû lê zêde kir, diyarkirina mezinahiya rastîn a keyeniyê û chorayê dijwar e; hin ji wan rasterast dihatin birêvebirin dema ku yên din destûr didan ku hukumdaran xwe wekî vasal bihêlin (çav: Biga, Maria Giovanna (2013). "Defining the Chora of Ebla : A textual perspective". In Matthiae, Paolo;

Marchetti, Nicolò (eds.). Ebla and its Landscape: Early state formation in the ancient Near East. Left Coast Press., p; 266).

Bi gelemperî, chora herêma bingehîn a Eblayê ye ku piştî paytextê digire nav xwe. Ew bajar û gundên ku key an wezîrê wî qesrên wan hebûn, bajarokên ku perestgehên girîng ên yazdanên bi saziya keyeniyê ve girêdayî bûn, bajarokên ku ji hêla key ve di dema rêûresmên cûda yên ku ew beşdarî wan bûye de serdana wan dihat kirin (wek rêûresma nûkirina keyeniyê), û bajarên din ên wekî yên ku tekstîl lê dihatin şandin, vedihewîne. Chora li dora 3000 km² dirêj dibe; ji rojava ber bi rojhilat ve deştên rojhilatê çiyayê Zawiya, zozana Maţkh, çiyayê el-Hass û çiyayê Şabîth vedihewîne. Herêmen rasterast li ser sînoren çora wek el-Xab, deşta el-Rûj û el-Cebbul xwedî têkiliyeke çandî ya nêzîk bi çora re ne (çav: D'Andrea, Marta; Ascalone, Enrico (2013). "Assembling the Evidence. Excavated Sites Dating from the Early Bronze Age in and around the Chora of Ebla". In Matthiae, Paolo; Marchetti, Nicolò (eds.). Ebla and its Landscape: Early State Formation in the Ancient Near East. Left Coast Press, p; 215).

Serdemên Mardikh II heman çand parve dikirin. Dihê texmînkirin ku nîfûsa Eblayê di dema Mardikh IIB1 (2400–2300 b.z) de li paytextê dora 40,000 û li tevahiya keyeniyê zêdetirî 200,000 kes bû. Eblayiyên Mardikh II nêzîkî cîranên xwe yên Semîtîk ên Bakur-rojava, wek Amorîtan, axaftvanên Semîtîk jî hebûn. Giovanni Pettinato got ku zimanê Eblayî, yek ji kevintirîn zimanên Semîtîk ên ku hatine birhankirin, zimanekî Semîtîk ê Rojava bû; Gelb û yên din digotin ku ew zaravayekî Semîtîk ê Rojhilat nêzîktir zimanê Akadî ye. Lihevkirina akademîk Eblayîyê wekî zimanekî Semîtîk ê Rojhilat dibîne ku hem taybetmendiyên Semîtîk ên Rojava û hem jî yên Rojhilat nîşan dide (çav: Rendsburg, Gary A. (1997). "Eblaïtes". In Meyers, Eric M. (ed.). The Oxford encyclopedia of archaeology in the Near East. Vol. 2. Oxford University Press, p; 183).

Lê çavkaniyên me didina nişandin ku wê, ji aliyekê din ve jî wê bi zimanî wê xwediyê rengdêriyek ku wê ne dûrî çerçoveya gûtî-kassit-hûrî bê.

Eblayê çend festîvalên olî û civakî li dar dixist, di nav de rêûresmên ji bo cîgirtina keyekî nû, ku bi gelemperî çend hefteyan dom dikirin. Salnameyên Eblai li ser bingeha saleke rojê ya ku di nav duwanzdeh mehan de dabeş dibû, hatine çêkirin. Du salname hatin keşîfkirin; "salnameya kevin" ku di dema serweriya Îgrîş-Helam de dihat

bikarhanîn, û "salnameyeke nû" ku ji hêla wezîr Îbî-Sîpîş ve hatibû destnîşan kirin. Gelek meh bi navê yazdanan hatin binavkirin; di salnameya nû de, "Îtû be-lî" meha yekem a salê bû, û tê wateya "meha yazdanê". Li şûna hejmarekê, her salekê navek lê dihat dayîn (çav: Podany, Amanda H. (2010). *Brotherhood of Kings: How international relations shaped the ancient Near East*. Oxford University Press., p; 34).

Jin mûçeyên wekhev ên mêran distandin û dikarîbûn bigihîjin meqamên girîng û serokatiya dezgehên hikûmetê bikin. Eblaî Kunga ji Nagarê îtxal dikirin, û wan ji bo kişandina erebeyên keyenî û karbidestên bilind, û her weha diyariyên dîplomatîk ji bo bajarên hevalbend bikar dihanîn. Cîvak li gorî keyeniyên Mezopotamyayê kêmtir li dora qesr û perestgehê bû. Qesra Eblaî li dora hewşê hatibû sêwirandin, ku ber bi bajêr ve vekirî bû, bi vî rengî rêveberiyê nêzîktir dikir. Ev yek berevajî qesrên Mezopotamyayê ye, ku dişibîyan kelehên bi deriyên teng û gihîştina wan a ber bi hewşa derve ve sînordar bû. Muzîk di civakê de roleke girîng dileyîze û muzîken hem xwecihî bûn, hem jî ji bajarên din ên wekî Mari weke ên dordorê ku wê girêdayî abla bin hatin kirêkirin. Eblayê jî kesûberên ji Nagarê kirê kirin, lê paşê hejmara wan kêmtir û hin ji wan hiştin da ku kesûberên herêmî yên Eblaî perwerde bikin (çav: Eidem, Jesper; Finkel, Irving; Bonechi, Marco (2001). "The third-millennium inscriptions". In Oates, David; Oates, Joan; McDonald, Helen (eds.). *Excavations at Tell Brak. Vol. 2: Nagar in the third millennium BC*. British School of Archaeology in Iraq., p; 101).

Gelheya Mardikh III bi piranî wek Amorîtên Semîtîk bûn. Di tabletên keyenîya yekem de behsa Amorîtan wekî cîran û xelkên gundan dihat kirin, Ev nişan dide ku ew di demên berê de wê weke komek civakî di nava yên xwecihî ên herêmê de didîjin û piştî serwer û serdestî herêmê bûna bi demê re û piştî hilweşîna keyenîya duyem ew li Eblayê serdest bûna. Li bajêr zêdebûnek mezin di avakirinê de çêbû, û gelek qesr, perestgeh û keleh hatin çêkirin. Eblaîyên ku Amorî diaxivîn gelek ji heman yazdanan wekî Eblaîyên ku Paleo-Sûryanî diaxivîn ên serdemên berê dipêristin, û pîroziya akropolê li navenda bajêr diparastin. Îkonografî û îdeolojiya keyenî ya keyenîya sêyem di bin bandûra çanda Yemhadê de bûn; keyenî ji yazdanên Yemhadê li şûna Îstarê Eblayê hat wergirtin, ku ev yek ji mohrên Eblayî yên serdema Indilimmayê diyar e (çav: Armstrong, James A. (1996). "Ebla". In Fagan, Brian M. (ed.). *The Oxford Companion to Archaeology*. Oxford University Press., p; 191).

Di serdema keyeniya yekem de, qesrê aboriyê kontrol dikir, lê malbatên dewlemend karûbarên xwe yên darayî bêî destwerdana hikûmetê birêve dibirin hebûn. Sîstema aborî ji nû ve belavker bû; qesrê xwarin li karkerên xwe yên daîmî û demsalî belav dikir. Tê texmînkirin ku nêzîkî 40,000 kes beşdarî vê pergalê bûne, lê bi gelemperî, û berevajî Mezopotamyayê, erd di destê gundan de ma, ku salane parek didan qesrê. Çandinî bi piranî şivanî bû; keriyên mezin ên pez ji hêla qesrê ve dihatin birêvebirin. Niştecihên bajêr xwediyê nêzîkî 140,000 serî pez û bizinan û 9,000 pez bûn (çav: Liverani, Mario (2013). *The Ancient Near East: History, society and economy*. Routledge., p; 124).

Ebla dewlemendiya xwe ji bazirganiyê digirt; dewlemendiya wê bi qasî ya bajarên herî girîng ên Sumerî bû, û reqîbê wê yê sereke yê bazirganî Marî bû. Tiştên sereke yên bazirganiyê yên Eblayê muhtemelen dar ji çiyayên nêzîk û tekstîl bûn. Her weha xuya ye ku hunerên destan hinardekirineke mezin bû, ku ev yek bi mîqdara berhemên ku ji qesrên bajêr hatine derxistin ve dihê birhankirin. Ebla xwediyê toreke bazirganî ya berfireh bû ku digihîşt heta Afganistana îroyîn. Ew tekstîlan dişand Qibrisê, dibe ku bi rêya bendera Ugarîtê, lê xuya ye ku piraniya bazirganiya wê bi qeyikê ber bi Mezopotamyayê ve dihat rêvebirin - bi taybetî Kish. Di qesra sereke G de berhemên ji Misira Kevnar ên ku navên fîrawûnên Khafre û Pepî I li ser wan hene hatin dîtin (çav: Pettinato, Giovanni (1991). *Ebla, a new look at history*. Johns Hopkins University Press, p; 155).

Ebla di dema keyeniya duyemîn de jî navendek bazirganiyê ma, ku ev yek bi bajarên derdorê yên ku di serdema wê de xuya bûn û bi bajêr re hatin wêrankirin ve dihê birhankirin. Bazirganî di dema keyeniya sêyemîn de jî çalakiya sereke ya aborî ya Eblayê bû; vedîtinên arkeolojîk nîşan didin ku danûstandinek berfireh bi Misir û bajarên peravê yên rojavayê kurdistanê yên heya wekî Byblos re hebû (çav: Matthiae, Paolo (2008). "Ebla". In Aruz, Joan; Benzel, Kim; Evans, Jean M. (eds.). *Beyond Babylon: Art, Trade, and Diplomacy in the Second Millennium B.C.. Metropolitan Museum of Art.* , p; 34).

Ebla dewletek pîryazdanî bû. Di dema keyeniya yekem de eblayiyan keyên xwe yên mirî dihebandin. Panteona Ebla ya yekem cotên yazdanan dihevwîne û ew dikarin di sê cureyan de werin dabeş kirin; di ya yekem û ya herî gelemperî de, cot hebûn, wek yazdan û hevjiîna wî ya jin. Cureyê duyem ê cotan du kesên yazdanî bûn, wek yazdanên ku ji bo afirandina kozmosê hevkarîyê dikin, mîna di panteonên Misir û Mezopotamyayê de.

Cureyê sêyem cotên yazdanî dihewîne ku di rastiye de yazdanekî yekane bûn ku du navên wan hebûn. Eblayîyan çend yazdanên Mezopotamyayê dihebandin, tercîh dikirin xwedayên Semîtik ên Bakur-Rojava, ku hin ji wan tenê ji bo Eblayê bûn. Cureyê yekem ê cotan Hadabal (NI-da-KUL) dihewîne, ku tenê li Eblayê bû, û hevîna wî, Belatu ("jina wî");[Rasap û hevîna wî Adamma; yazdanên serek ên bajarê Kura, ku tenê li Eblayê bû, û hevîna wî Barama bû (çav: McNulty, Mary F.; Brice, Elizabeth (1996). "Ebla". In Berney, Kathryn Ann; Ring, Trudy; Watson, Noelle; Hudson, Christopher; La Boda, Sharon (eds.). *Middle East and Africa*. Vol. 4: *International Dictionary of Historic Places*. Routledge., p; 246).

Cureyê sêyem yazdanê hunermend Kamîş/Tît, Kothar-wa-Khasis û gerstêrka Venusê ku ji hêla yazdanên çiyayî yên cewî ve tê nûminêr kirin; Şehar wekî stêrka sibê û Şalim wekî stêrka êvarê dihewîne (çav: Stieglitz, Robert R. (2002a). "Divine Pairs in the Ebla Pantheon". In Gordon, Cyrus Herzl; Rendsburg, Gary (eds.). *Eblaitica: Essays on the Ebla Archives and Eblaite Language*. Vol. 4. Eisenbrauns., p; 209).

Eblayîyên pêşîn gelek yazdanên din dihebinin, wekî yazdana rojavayê kurdistanî Îşara, ku yazdana malbata keyene bû. Îştar jî di hate perestîn lê di yek ji navnîşên pêşkêşkirina mehane de tenê pênc caran dihat behs kirin, di heman demê de Îşara pir girîngtir bû, 40 caran xuya bû. Yazdanên din Damu; yazdanê Mezopotamyayê Utu; Ashtapi; Dagan; Hadad (Hadda) û hevîna wî Halabatu ("ya Halab"); û Shipish, yazdana rojê ku perestgehek ji bo kulta xwe hebû. Çar deriyên bajêr li ser navê yazdanên Dagan, Hadda, Rasap û Utu hatine binavkirin, lê nayê zanîn ka kîjan derî kîjan navî hebû. Bi tevahî, navnîşa pêşkêşan behsa nêzîkî 40 yazdanan kir ku qurbanî distandin (çav: Feliu, Lluís (2003). *The God Dagan in Bronze Age Syria*. Translated by Watson, Wilfred G.E. Brill.p; 8-9).

Tiştêkê din jî wê weke ku wê di roja me de wê li sûra amedê wê weke çar deriyê wê hebin û her yekê wê li aliyekê wê vebê ev wê ne tenê wê weke têgînek bi wê aliyê ve çûnûhatinê û an rewşek parastinê tenê bê. Ji wê zêdetirî wê di wê temenê de wê, ev wê weke kevneşopîyek baweriyê a di demên gûtiyan û piştî wê di dema hûriyan de jî wê bi berdewamî wê di wê temenê de wê were dîtin ku wê xwe bide diyarkirin û domandin.

Di dema keyeniya sêyemîn de, Amorî yazdanên hevpar ên Semîtik ên bakur perizîn; yazdanên bêhempa yên Eblaî winda bûn. Hadad yazdanê herî girîng bû, lê Îştar cihê Îşara girt û ji bilî Hadad bû yazdanê herî girîng ê bajêr (çav: Archi, Alfonso (2002). "Formation of the West

Hurrian Pantheon: The Case Of Ishara". In Yener, K. Aslihan; Hoffner, Harry A.; Dhesi, Simrit (eds.). *Recent Developments in Hittite Archaeology and History*. Eisenbrauns.p; 31).

Di destpêka pêvajoya deşîfrekirina tabletan de, Giovanni Pettinato îdiayên li ser girêdanên muhtemel ên di navbera Ebla û Incîlê de kir, behsa referansên îdiakirî yên di tabletan de ji bo hebûna Yahweh, Patrik, Sodom û Gomorrah û referansên din ên Incîlê kir. Lêbelê, piraniya heyecana medyayê ya destpêkê li ser girêdanên îdiakirî yên Eblaî bi Incîlê re, ku li ser texmîn û texmînên pêşîn ên Pettinato û yên din hatine çekirin, niha bi berfirehî tê redkirin û lihevkarina akademîk ew e ku Ebla "tu eleqeya wê bi peyamnêrên Biçûk, rastbûna dîrokî ya Patrikên Incîlê, perestina Yahweh, an Sodom û Gomorrah re tune". Di lêkolînên Eblayê de, bal ji berawirdkirina bi Incîlê re dûr ketiye; Ebla niha wekî şaristaniyek bi serê xwe tê lêkolîn kirin. Îdiayan bûn sedema pevçûnek kesane û akademîk a di jwar di navbera zanyarên têkildar de, û her weha tiştê ku hin kes wekî destwerdana ramyarî ya rayedarên rojavayê kurdistanê û sûriyeyê bi nav dikin (çav: Chavalas, Mark W. (2003). Chavalas, Mark W. Jr.; Younger, K. Lawson (eds.). "Mesopotamia and the Bible". *Assyriology and Biblical studies: A century and a half of tension*. Journal for the Study of the Old Testament Supplement. 341. A&C Black, p; 41).

Di sala 1964an de, arkeologên Îtalî ji Zanîngeha Romya La Sapienza di bin rêveberiya Paolo Matthiae de li Tell Mardikh dest bi kolandinan kirin. Di sala 1968an de, wan peykerê ku ji bo yazdana Îştar hatibû veqetandin û navê wî Ibbit-Lim bû, û wî wekî keyê Eblayê bi nav dikir, dît. Ev peyker bajar nas kir, ku ji nivîsên Lagashê û Akadîkî ve demek dirêj tê zanîn. Di deh salên pêş de, tîmê qesrek (qesra G) keşf kir ku dîroka wê ji dora 2500-2000 b.z. ye. Di nav keşan de peykerek piçûk a ji materyalên hêja, Lapis lazuli, kevirên reş û zêr hatiye çekirin heye (çav: Liverani, Mario (2013). *The Ancient Near East: History, society and economy*. Routledge.p; 129).

Sêzdeh tabletên bizmarî ên 'lentîkulî' yên tijî û qat qat di odeya textê qesrê de hatin dîtin, ku tê texmînkirin ku li wir ji ber ketina bajêr li beramberî arşîvê bûn. Di depoyekê de li kêleka odeya text, alaya hema bêje temam a keybanûyê û qatên ku tê bawerkirin ku ji alaya key tîn hatin dîtin. Berhemên din mobîlyayên darîn ên bi inciyan hatine xemilandin û peykerên tevlihev ên ji kevirên rengîn hatine çekirin jî di nav de bûn. Kaseyek zîv a ku navê key Immeya li ser bû, ji "Gora

yazdanê Bizinan" hat dîtin, digel gewherên Misrî û gopalek merasîmê ya Misrî ku ji hêla firawn Hotepibre ve hatî pêşkêş kirin, dihê kifşkirin (çav: Akkermans, Peter M.M.G.; Schwartz, Glenn M. (2003). *The Archaeology of Syria: From Complex Hunter-Gatherers to Early Urban Societies (c. 16,000-300 BC)*. Cambridge University Press, p; 271).

Nêzikî 17,000 qatên tabletên bizmarî hatin dîtin; dema ku bi hev re werin danîn, ew 2,500 tabletên temam pêk tînin, ku arşîva Eblayê dike yek ji mezintirîn ji hezarsala 3'în berî zayînê. Nêzikî 80% ji tabletan bi karhanîna tîkeliya logogram û nîşanên fonetîk ên Sumerî yên asayî hatine nivîsandin, dema ku yên din numinêrek nûjen û bi tevahî fonetîk bi karhanîna alaya bizmarî ya Sumerî ya zimanek Semîtî ya berê nenas, ku jê re "Eblaite" dihat gotin, nîşan dan. Lîsteyên ferhenga duzimanî ya Sumerî/Eblaî di nav tabletan de hatin dîtin, ku ev yek rê da wergerandina wan. Tablet gelek têgihiştinên girîng li ser jiyana çandî, aborî û ramyarî ya li bakurê Mezopotamyayê li dora nîvê hezarsala 3'în a berî zayînê peyda dikin. Ew her wiha têgihiştinê li ser jiyana rojane ya niştecîhan peyda dikin, û agahdariyên li ser dahatên dewletê, ferhengên Sumerî-Eblaî, danûstandinên dîplomatîk bi hukumdaran biyanî re, nivîsên dibistanê, îlahî û efsaneyan di hewînî (çav: Pitard, Wayne T. (2001) [1998]. "Before Israel: Syria-Palestine in the Bronze Age". In Coogan, Michael David (ed.). *The Oxford History of the Biblical World* (revised ed.). Oxford University Press., p; 32).

Tabletên ku zêdetirî 4000 salî ne, pirtûkxaneya herî kevin a ku heta niha hatiye dîtin pêk tînin. Li Eblayê, "arşîv an pirtûkxane berhevokek rêkûpêk a tomarên ku herî kêr 500 sal ji yên din ên ku berê li her deverê hatine dîtin kevintir bûn." Birhanên rêzkirin û dabeşkirina wan hene. Tabletên mezintir di destpêkê de li ser refîkan hatibûn hilanîn, lê dema ku qesr hate hilweşandin ketin erdê. Cihên tabletên ketî rê dan kolvanan ku cihên xwe yên resen li ser refîkan ji nû ve ava bikin. Wan dît ku tablet di destpêkê de li gorî mijarê hatibûn danîn (çav: Franks, Patricia C. (2013). *Records and Information Management*. American Library Association, p; 2-5).

Ev taybetmendî di kolandinên Sumerî yên berê de tune bûn. Teknîkên sofîstîke yên rêzkirina nivîsan, digel pêkhatina wan, birhanên kevnariya mezin a pratîkên arşîv û pirtûkxaneyê ne, ku dibe ku ji ya ku berî kifşkirina pirtûkxaneya Eblayê dihat texmînkirin pir kevintir bin. Beşek girîng a tabletan nivîsên edebî û ferhengografîk di hewînê; birhan nîşan didin ku berhevok - bi kêmanî qismî - wekî pirtûkxaneyek rastîn xizmet

kiriye, ne wekî berhevokek arşîvan ku tenê ji bo keyan, wezîrên wan û burokrasiya wan hatiye çêkirin. Tablet birhanên nivîsandina zû ya nivîsan bo ziman û nivîsên biyanî, dabeşkirin û katalogkirin ji bo vegerandina hêsantir, û rêzkirina li gorî mezinahî, form û naverokê nîşan didin. Bi vî awayî tabletên Eblayê têgihîştinên nû li ser eslê pratîkên pirtûkxaneyê yên ku 4,500 sal berê dihatin bikar hanîn, dane zanyaran (çav: Wellisch, Hans H. (1981). "Ebla: The World's Oldest Library". *The Journal of Library History*. 16 (3). University of Texas Press: p; 488–500).

Her çend kronolojiya teqez a arşîvê hîn ne diyar be jî, kronolojiyek nisbî ji bo serdema 50 salan hatiye damezrandin. Ji ber ku Eblayê navên salan an hejmarên salan ên bi şewaza Mezopotamyayê bikar nehaniye û navê hukumdarên di nivîsan de kêman caran dihat behs kirin, zanyar guhertinên nivîsê, guhertinên rêzimanê, û ya herî girîng jî prosopografiya endamên dadgehê, jin û keçên key, bikar hanîne. Tabletên herî têkildar ji bo vê hewildanê rêzek hesabên metal ên salane û hesabên keten ên mehane bûn (çav: Biga, Maria Giovanna, and Francesco Pomponio., "Elements for a Chronological Division of the Administrative Documentation of Ebla.", *Journal of Cuneiform Studies*, vol. 42, no. 2, pp. 179–201, 1990).

Gelek navên ji wan dihên kifşkirin wê navên sumerî û gûtîyî bin. Di wê çerçoveyê de wê karibê wê bibêjê ku wê dahûrkirina navan wê bi serê xwe wê karibê têgihîştinek xort wê di wê warê de wê di derbarê fahmkirina demê de wê ji aliyekê ve wê karibê bide mirov. Pîraniya tablet û qatên tabletên ku hatine dîtin li Muzexaneyê Herêmî ya Îdlibê li Sûriyeyê hatine hilanîn. Rewşa wan a niha nayê zanîn.

Keyaniya yekem a Eblayê mînaqek ji dewletên navendî yên destpêkê yên li ser axa rojavayê kurdistanê û sûriyeyê ye, û ji hêla zanyarên wekî Samuel Finer û Karl Moore ve wekî yek ji împaratoriyan herî kevin dihê hesibandin, ku ew wekî yekem hêza cîhanî ya tomarkirî dibînin. Vedîtina Eblayê nêrîna kevin a dîroka rojavayê kurdistanê û sûriyeyê wekî pirek di navbera Mezopotamya û Misrê de guherand; wê birhan kir ku herêman bi serê xwe navendek şaristaniyê bû (çav: McBee Roberts, Jimmy Jack (2002). *The Bible and the Ancient Near East: Collected Essays*. Eisenbrauns, p; 12).

Wê dema ku ev van rewş û gotinên li ser ebla li berçav digirin û em bi gotin û vegotinên li ser gûtîyan ên nava kurdan ku wê heta roja me wê bi têgihên weke "ji bakûrê mesopotamya û heta ber zagrosan wê pêşde herin

û wê serwer bibin" ku wê werina ser ziman û wan di dewama wan gotina de weke kirde û çavkaniyek fahmkirinê bi hasibênin wê demê wê, weke di ahenge wê de wê têgihiştinekê wê weke ku wê bidina me. Di aslê xwe de wê, di wê temenê de wê, dîroka wê demê wê, ji wê aliyê ve wê, pêwîsta ji gelek aliyên ve wê bi rohnikirina wê hebê. Rewşa bajarên wê demê ên ku ew dijin wê piştî wê hin bi hin wê çawa wê mazin û bi bandûr bibin bi rewşên ramyari wê di wê warê de wê, karibê têgihekê wê bide me. Dewama ebla de wê bajarê eshnunna wê di renekê de wê karibê wê di dewama wê de wê, weke aliyekê wê yê din wê di dewama wê de wê li ser wê bisekin in. Ev jî wê weke aliyekê wê yê din wê bi ahenge fahmkirina wê demê re wê di renekê de wê weke karibê têgihiştinekê bide me. Demên pêşî ên Eshnunna û yên piştê ên duyem weke yên bi rengê bi keyeniya ebla re ku wê karibin werina fahmkirin wê di renekê ne dûrî wê de wê têgihiştinekê wê bi xwe re wê weke ku wê bidina diyarkirin.

Eşnûnnayê navê wê bi morfolojikî wê weke yê mitannî û an hûrî û an 'hûrrî' ku wê were diyarkirin wê têgihihekê wê bi xwe re wê bide diyarkirin. Di wê rengê de wê bi rêzimanîya roja me de wê, weke ji navê Eşnûnnayê '..nnayê' bê, ji navê mitannî 'nniyê' bê û an ji navê hûrrî '..rrîyê' bê wê, di wê temenê de wê têgînek rengdêrî wê, karibê wê fahmbikê.

Eshnûnna (her weha wek Eshnunak jî) (Tell Asmar a îroyîn li parêzgeha Diyala, başûrê kurdistanê û Iraqê) bajarekî kevnar ê Sumerî (û paşê Akadî) û bajar-dewletek bû li navenda Mezopotamyayê 12.6 mîl li bakurê rojavayê Tell Agrab û 15 mîl li bakurê rojavayê Tell Îşxalî. Her çend li Geliyê Diyala li bakurê rojavayê Sumerê ye jî, bajar dîsa jî bi ewlehî di nav hawîrdora çandî ya Sumerî de cih digirt. Carinan, di belgeyên arkeolojîk ên pir zû de, jê re Aşnûnnak an Tupliaş tê gotin (çav: Ungnad, A., "Zu den Patesis von Tupliaš", *Orientalistische Literaturzeitung*, vol. 12, no. 1-6, 1909, pp. 81-81, 1909).

Yazdanê parêzvan ê bajêr Tishpak (Tišpak) bû, her çend yazdanên din, di nav de Sin, Adad, û Inanna yên Kiti (Kitîtum) jî li wir dihatin perestîn. yazdanên kesane yên hukumdarên Belet-Šuḫnir û Belet-Terraban bûn, ku wê yên wê dema gûtiyan û berê wê bin.

Eshnûnna (Eşnûnna), ku ji serdema Jemdet Nasr, li dora sala 3000 berî zayînê de lê hatiye niştecîkirin, di serdema Xanedaniya Destpêkê ya Mezopotamyayê a dema gûtiyan de bajarekî girîng bû. Ji tomarên bi nivîsên bizmarî û kolandinan tê zanîn ku bajar di serdema Akadî de

hatiye dagirkirin, her çend berfirehiya wê ji ya ku di serdema Ur III de gihîştîye wê pir kêmtir bû. Herêmen Qesra Bakur ji vê serdemê ve ne û hin ji mînaqên herî zû yên endezyariya avêtina kanalizasyonê ya berbelav nîşan didin, di nav de tuwaletên di malên taybet de jî hene (çav: George, A. R. "On Babylonian Lavatories and Sewers.", Iraq, vol. 77, 2015, p. 75–106).

Serwerên yekem ên bajarî yên ku têne zanîn rêzek parêzgarên vasal di bin Xanedaniya Sêyemîn a Ur de bûn. Dibe ku Eşnûnna têkiliyên taybetî bi malbata keyenî re hebûn. Mînaqî, jina Şulgî Şulgî-Sîmtûm dilsoziya xwe ji du yazdanên ku bi xanedaniya parêzgar re li Eşnûnna ve girêdayî ne nîşan da, û apê Shu-Sin Babati demkî li Eşnûnna dijiya (çav: Reichel, C. 2008. "The King is Dead, Long Live the King: The Last Days of the Šu-Sîn Cult at Ešnunna and its Aftermath.", In: N. Brisch (ed.), Religion and Power. Divine Kingship in the Ancient World and Beyond, 133-155. OIS 4, Chicago).

Îturya wekî parêzgarê Eşnûnnayê di bin desthilatdariya Urê de ji herî kêr Su-Sun sala 9an heta Ibî-Sin sala 2an tê birhankirin. Wî li bajarekî nû yê jêrîn perestgehek ji bo Shu-Sin ava kir. Piştî mirina Shu-Sin, kurê wî Šu-ilišu li pey Îturya hat, ku di sala 2026 b.z de salnameya Ur III ji holê rakir û li şûna wê salnameyek herêmî danî. Wî her weha dev ji xwe wekî ensî (parêzgarê) Eşnûnnayê berda, li şûna wê xwe wekî lugal (key) û "evîndarê Tişpak" bi nav kir. Mohra wî her weha yazdanên Belat-Şuhnir û Belat-Terraban behs kir. Mohra wî ya kesane wî nîşan dide ku rûyê wî bi yazdanê Tişpak re ye, ku di destekî xwe de darek û zengilek û di destê din de jî kêrek digire dema ku li ser du dijminên bindest radiweste (çav: Peyronel, Luca (2013-01-01), "Elam and Eshnunna: Historical and Archaeological Interrelations during the Old Babylonian Period", Susa and Elam. Archaeological, Philological, Historical and Geographical Perspectives, Brill, p. 51–70).

